HÎNKER

Asta Yekemîn

Ronayî Onen | Samî Tan
Mevlut Aykoç | Sadik Varli

ENSTÎTUYA KURDÎ YA STENBOLÊ

NAVEROK Û PLAN

UNÎTE	MIJAR	RÊZIMAN	ARMANC	PEYV
	A- Alfabe *r.* **4** B- Ferman *r.* **6** C- Rojbaş *r.* **7**	1- Alfabe	1- Dê alfabeyê hîn bibin.	1- Hin peyvên rojane têne bikaranîn.
2 Kar ß	A- Hevnasîn *r.* **8** B- Lihevpirsîn *r.* **10** HÎNDARÎ *r.* **11** C- Nasîna kes û tiştan *r.* **12** HÎNDARÎ *r.* **18** **UNÎTE 1 - SPARTEK** *r.* **19-21**	1-Cînavkên kesane yên tewandî 2- Cînavkên kesane yên xwerû 3- Qertafên kesane 4- Cînavkên şanîdanê yên xwerû 5- Cînavkên pirsiyariyê yên xwerû	1- Dê bi vê unîteyê hînî hin hevokên bingehîn bibin. 2- Dê bikaribin xwe bidin nasîn û hevalên xwe nas bikin.	1- Navên alav û navgînên di fêrgehê de 2- Hin peyvên rojane têne bikaranîn.
	A- Hejmar *r.* **22** HÎNDARÎ *r.* **23** B- Kar û pîşe *r.* **24** HÎNDARÎ *r.* **26** C- Cih *r.* **28** D- Heye / Hene *r.* **29** **UNÎTE 2 - SPARTEK** *r.* **30-31**	1- Hejmar 2- Daçek 3- Qertafên nebinavkirinê	1- Dê hewl bidin ku navên pîşeyan hîn bibin. 2- Dê hewl bidin ku hevokên bi pîşe û cih-pirsînê ve girêdayî hîn bibin û bi kar bînin. 2- Dê hejmaran hîn bibin.	1- Navên pîşeyan 2- Hejmar 3- Hin peyvên rojane têne bikaranîn.
4 Jiyana Ro	A- Danasîna malbatê *r.* **32** B- Danasîna kesan *r.* **39** HÎNDARÎ *r.* **41** **UNÎTE 3 - SPARTEK** *r.* **42-45**	1- Veqetandek 2- Tewang	1- Dê hin peyvên xizimtiyê hîn bibin. 2- Dê hewl bidin ku xizmên xwe bidin nasîn. 3- Dê peyvên bi laş ve girêdayî hîn bibin.	1- Peyvên xizimtiyê 2- Hin navên beşên laşê mirov 3- Hin peyvên rojane têne bikaranîn.
	A- Çalakiyên rojane *r.* **46** HÎNDARÎ *r.* **49** B- Rojeke Dîlanê *r.* **50** C- Bernameya Dîlanê ya heftane *r.* **51** HÎNDARÎ *r.* **52** D- Dem û demsal *r.* **54** E- Saet *r.* **56** **UNÎTE 4 - SPARTEK** *r.* **58-61**	1- Dema niha 2- Tewang 3- Daçek 4- Tewang (nebinavkirî) 5- Lêkerên Hevedudanî 6- Xwe	1- Dê peyv û hevokên bi jiyana rojane ve girêdayî hîn bibin. 2- Dê navên demsal, meh, roj, danên rojê, danên xwarinê hîn bibin. 3- Dê saetê nas bikin û bikaribin saetê bipirsin û pirsên der barê saetê de bibersivînin.	1- Navên, demsal, meh, roj, danên rojê, danên xwarinê 2- Hin peyvên rojane têne bikaranîn.

NAVEROK Û PLAN

UNÎTE	MIJAR	RÊZIMAN	ARMANC	PEYV
	A- Muzîk *r.* **62** B- Werzîş *r.* **64** C- Şano û sînema *r.* **66** D- Xwendin *r.* **67** **UNÎTE 5 - SPARTEK** *r.* **68-71**	1- Gihanek	1- Dê hewl bidin ku peyv û hevokên rojane têne bikaranîn hîn bibin. 2- Dê peyv û hevokên bi muzîk, werzîş, şano û sînemayê ve girêdayî hîn bibin.	1- Navên werzîşan 2- Peyvên rojane têne bikaranîn.
7 Cil B	A- Li malê *r.* **72** HÎNDARÎ *r.* **74** B- Li sûkê *r.* **75** C- Kiriyarî *r.* **77** D-Têkberên elektronîk *r.* **78** **UNÎTE 6 - SPARTEK** *r.* **80-85**	1- Raweya fermanî 2- Xwestin 3- Raweya bilanî	1- Dê navê sebze, meyve û têkberên elektronîk hîn bibin. 2- Dê hevokên ku bi sebze, meyve û têkberên elektronîk ve girêdayî hîn bibin û hewl bidin ku bikarbînin. 3- Dê peyv û hevokên di kiriyariyê de têne bikaranîn hîn bibin û bi kar bînin.	1- Navên sebzeyan 2- Navên fêkiyan 3- Navên têkberên elektronîk 4- Peyvên kiriyariyê
	A- Cil û berg *r.* **86** HÎNDARÎ *r.* **89** B-Ez dikarim… *r.* **92** C- Divê ez çi bikim? *r.* **94** **UNÎTE 7 - SPARTEK** *r.* **96-97**	1- Karîn 2- Divêtî 3- Lêkerên hevedudanî	1- Dê navên cil û bergan hîn bibin. 2- Dê hewl bidin ku peyv û hevokên bi cil û bergan ve girêdayî di jiyana rojane de bi kar bînin.	1- Navên cil û bergan 2- Hin peyvên ku di jiyana rojane de têne bikaranîn.
	A- Xwendin *r.* **98** B- Bikaranîna zimên *r.* **99** C- Çand *r.* **101**	1- Lêkerên hevedudanî	1- Dê mijarên ku hîn bûne dubare bikin û hewl bidin ku van hevok û peyvan di jiyana rojane de bi kar bînin.	1- Hin peyvên ku di jiyana rojane de têne bikaranîn.
	Lêkerên xwerû *r.* **102** Lêkerên pêkhatî (-in) *r.* **103** Lêkerên pêkhatî (-andin) *r.* **104** Lêkerên pêkhatî yên ku bi pêşgiran çêdibir *r.* **105**	1- Hin lêker û kişandina wan	1- Dê hin lêkeran û kişandina wan hîn bibin.	1- Hin lêkerên ku rojanê têne bikaranîn.

DESTPÊK

- Alfabe
- Ferman
- Rojbaş

A- Alfabe

Tîpên girdek

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z

Tîpên hûrdek

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Tîpên dengdar

b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

Tîpên dengdêr

a e ê i î o u û

Pevdeng

xw

A a	agir, av, ax
B b	baş, beyanî, aborî
C c	cîran, îcar, cih
Ç ç	çav, çar, çente
D d	dev, derî, dep
E e	erd, zer, ewr
Ê ê	êzing, êvar, kêr
F f	fêrgeh, berf, heft
G g	gore, gul, gir
H h	hefte, heval, guh
I i	incas, diran, bivir
Î î	îro, dîk, derî
J j	jin, jêbir, roj
K k	kevok, hêk, kum
L l	lênûsk, lêv, pel
M m	mal, mamoste, dem
N n	nan, hinar, deng
O o	ol, pol, to
P p	pêl, pênûs, peyv
Q q	quling, qenc, qad
R r	roj, tor, şêr
S s	sêv, hesin, mase
Ş ş	şev, şimik, aş
T t	tîp, tembûr, met
U u	utî, gul, du
Û û	ûr, şûr, tû
V v	vizik, av, çav
W w	werdek, dew, kew
X x	xelat, ax, xanî
Y y	yek, peya, yar
Z z	zîv, zêr, kezî
XW	xwendin, xwe, xwê

A- **a**gir

B- **b**eq

C- **c**otkar

Ç- **ç**av

D- **d**erî

E- **e**wr

Ê- **ê**zing

F- **f**iroke

G- **g**uh

H- **h**esp

I- **i**vir

Î- **î**sot

J- **j**ûjî

K- **k**ew

L- **l**epik

M- **m**asî

N- **n**an

O- **o**r

P- **p**el

Q- **q**uling

R- **r**oj

S- **s**êv

Ş- **ş**eh

T- **t**irî

U- **u**l

Û- **û**reşk

V- **v**av

W- **w**erîs

X- **x**anî

Y- **y**ek

Z- **z**ebeş

Hevrûkirina deng û tîpan

E	Ê
ker	kêr
zer	zêr
der	dêr
şer	şêr

U	Û
du	dû
tu	tû
kur	kûr
kuçik	kûçik

I	Î
jin	jîn
şiv	şîv
pir	pîr
dil	dîl

V	W
dev	dew
ev	ew
vir	wir
vî	wî

XW

xwarin, xwîn, xwişk, xwedî, xwelî

B- Ferman

Bixwînin

Binivîsin

Bibersivînin

Binêrin

Guh bidinê

Dubare bikin

Cihên vala dagirin

C- Rojbaş



- Hevnasîn
- Lihevpirsîn
- Nasîna kes û tiştan
- Spartek

A- Hevnasîn

1- Navê te çi ye?
Navê min _____ e/ye.

Dîlan Rojbaş! Navê min Dîlan e.
Navê te çi ye ?
Azad Rojbaş! Navê min Azad e.

Navê **wê** çi ye?
Navê **wê** Hêlîn e.

Navê **wî** çi ye?
Navê **wî** Diyar e.

Cînavkên kesane yên tewandî

Cînavkên kesanê yên tewandî	**Mînak**
Min	Navê min Rodî ye.
Te	Navê te Zelal e.
Wî (nêr)	Navê wî Serdar e.
Wê (mê)	Navê wê Rojda ye.
Me	Navên me Ronî û Besna ne.
We	Navên we Zelal û Şîlan in.
Wan	Navên wan Hawar û Derya ne.

2- Tu ji ku derê yî ?
Ez ji _____ me.

Dîlan Azad, tu ji ku derê yî?
Azad Ez ji Am¾dê me. Lê tu?
Dîlan Ez ji Kobanê me.

Hêlîn ji ku derê ye?
Ew ji Efrînê ye.

Ew ji ku derê ye?
Ew ji Qam´кlo ye.

Ew ji ku derê ne?
Ew ji Kobanê ne.

Cînavkên kesane yên xwerû

Cînavkên kesanê yên xwerû	Mînak
Ez	Ez ji D° r´k° me.
Tu	Tu ji Qam´кlo yî.
Ew	Ew ji Dirb° siy° ye.
Em	Em ji Am¾dê ne.
Hûn	Hûn ji Efr´n° ne.
Ew	Ew ji Kobanê ne.

B- Lihevpirsîn

Tu çawa yî?

Ez baş im.

Diyar Rojbaş Azad tu çawa yî?
Azad Zor spas, ez baş im.
Tu çawa yî?
Diyar Spas, ez jî baş im.

Dîlan Beyanîbaş Hêlîn
tu çawa yî?
Hêlîn Ez baş im, spas. Lê tu?
Dîlan Ez jî baş im, spas.

Qertafên kesane

Cînavkên kesanê yên xwerû	Qertafên kesane
Ez	-im/me
Tu	-î/yî
Ew	-e/ye
Em	-in/ne
Hûn	-in/ne
Ew	-in/ne

Ez	xwendekar	im.
Tu		î.
Ew		e.
Em		in.
Hûn		in.
Ew		in.

Ez	mamoste	me.
Tu		yî.
Ew		ye.
Em		ne.
Hûn		ne.
Ew		ne.

Hîndarî

1- Vê diyalogê bixwînin û bi hev re li ser bixebitin.

Azad Rojbaş! Navê min Azad e. Navê te çi ye?
Dîlan Rojbaş! Navê min Dîlan e.
Azad Tu ji ku derê yî Dîlan?
Dîlan Ez ji Kobanê me. Lê tu?
Azad Ez jî ji Am¾dê me.
Dîlan Ez bi nasîna te kêfxweş bûm.
Azad Ez jî.

2- Valahiyen li jêr dagirin.

Azad Rojbaş navê _____ çi ye?
Hêlîn Rojbaş navê _____ Hêlîn e. _____ te çi ye?
Azad Navê min _____ e.
Hêlîn Tu ji _____ derê yî?
Azad Ez _____ Am¾dê me. Lê tu?
Hêlîn _____ ji Dirb° siy° me.

3- Cihên vala dagirin.

Azad Rojbaş Dîlan tu _____ yî?
Dîlan Rojbaş Azad, _____ baş im, tu çawa _____?
Azad Ez jî baş _____, zor spas. Ev hevala min e. Navê wê Hêlîn e.
Dîlan Merheba Hêlîn, tu çawa yî?
Hêlîn Ez baş im, spas.
Dîlan Hêlîn tu ji _____ derê yî?
Hêlîn Ez _____ Mêrdînê me.
Dîlan Ez bi nasîna te kêfxweş bûm.
Hêlîn Ez jî.

4- Cihên vala dagirin.

Hêlîn Beyanîbaş Diyar tu çawa _____?
Diyar Beyanîbaş Hêlîn, ez baş _____, spas. Tu _____ yî?
Hêlîn Ez jî _____ im spas. Ev hevala min e. _____ wê Dîlan e.
Diyar Merheba _____, tu çawa yî?
Dîlan Spas, _____ baş im.
Diyar Dîlan, tu ji ku _____ yî?
Dîlan Ez ji D° r´kê _____.
Diyar Ez bi nasîna te kêfxweş bûm.
Dîlan Ez jî.

5- Li gorî xwe valahiyên li jêr dagirin.

Navê te çi ye?
Navê min _____ e/ye.
Tu ji ku derê yî?
Ez ji _____ me.

6- Du heval bên bal hev cihên vala li gorî xwe dagirin.

A Rojbaş, navê min _____ e/ye. Navê te çi ye?
B Rojbaş, navê min ___ _____ e/ye.
A Tu ji ku derê yî?
B Ez ji _____ me. Lê tu?
A Ez ji _____ me.
B Ez bi nasîna te kêfxweş bûm.
A Ez jî.

C- Nasîna kes û tiştan

1- Ev / ew kî ye?

Ev Azad e.

Ev Dîlan e.

Ew kî ye?

Ew Rojda ye.

Cînavkên şanîdanê yên xwerû

Ev (nêzîk)
Ev pênûs e. (yekjimar)
Ev pênûs in. (pirjimar)
Ew (dûr)
Ew rojname ye. (yekjimar)
Ew rojname ne. (pirjimar)

2- Ev / ew çi ye?

Ev kompîtur e.

Ew kursî ye.

Ev → (nêzîk) Ew → (dûr)

Ev kursî ye.

Ev mase ye.

Cînavkên pirsiyarî yên xwerû

Kî

Tu **kî** yî?	Ez Dilşa me.
Ew **kî** ye?	Ew Zîlan e.
Ew **kî** ne?	Ew Azad û Dîlan in.

Çi

Ev **çi** ye?	Ev lênûsk e. (yekjimar)
Ev **çi** ne?	Ev jêbir in. (pirjimar)
Ew **çi** ye?	Ew dep e. (yekjimar)
Ew **çi** ne?	Ew çente ne. (pirjimar)

Ew kursî ye.

Ew mase ye.

3- Navên van tiştan li bin wan binivîsin.

lênûsk	dep	jêbir	nexşe	kaxiz	p° n¾sbir	pênûsdank	kilspî
pênûs	pirtûk	çente	rastkêş	demjimêr	ferheng		

1)_____

2)_____

3)_____

4)_____

5)_____

6)_____

7)_____

8)_____

9)_____

10)_____

11)_____

12)_____

13)_____

14)_____

4- Ez ne ji _____ me.

Navê min ne Rojda ye. Navê min Dîlan e.

Ez ne ji Kobanê me. Ez ji Am¾dê me

Diyar ne ji Heleb° ye. Ew ji Efr´n° ye.

Ew ne mase ye. Ew kursî ye.

1- Li gorî mînakê hevokan bikin neyînî.

Mînak

Ez ji Ser° kaniy° me. (D° r´k)

Ez ne ji Ser° kaniy° me. Ez ji D° r´kê me.

1- Navê min Rûşen e. (Rûken)

_____

2- Ew Arda ye. (Adar)

_____

3- Ew dep e. (jêbir)

_____

4- Em ji Bedlîsê ne. (Gimgim)

_____

5- Ev lênûsk in. (ferheng)

_____

5- Ew Azad e?

Ew Azad e?

Erê, ew Azad e.

Ew Bermal e?

Na, ew ne Bermal e.
Ew Dîlan e

Navê te Azad e?

Erê, navê min Azad e.

Navê te Lezgîn e?

Na, navê min ne Lezgîn e. Navê min Ferzende ye.

1- Li gorî mînakê pirsan bibersivînin.

Mînak

Mînak: Tu ji Kobanê yî? (Na / Efrîn)
Na, ez ne ji Kobanê me. Ez ji Efrînê me.

1-Navê te Sozdar e? (Erê)

_____

2- Tu xwendekar î? (Na / mamoste)

_____

3- Ew jêbir e? (Na / qelemtraş)

_____

4- Ew ji Hewlêrê ye? (Erê)

_____

5- Tu baş î? (Erê)

_____

Hîndarî

1- Cihên vala dagirin.

1- Ez ji Kobanê ____.
2- Tu ji ku derê ____?
3- Em ji Efr´nê ____.
4- Derya ji D° r´k° ____.
5- Hûn ji ku derê ____?
6- Ev Sîdar ____.
7- Ev pirtûk ____. (pirjimar)
8- Ew lênûsk ____. (yekjimar)

2- Cihên vala dagirin.

1- Ev _____ ye?
Ev Roza ye.
2- Ev _____ ne?
Ev jêbir in.
3- Navê _____ çi ye?
Navê wê Zelal e.
4- Navên _____ çi ne?
Navên wan Hozan û Şerzan in.
5- Tu ji _____ derê yî?
Ez ji Ser° kaniy° me.

3- Cihên vala dagirin.

Azad Rojbaş, Serhat _____ çawa yî?
Serhat Rojbaş, Azad. Ez _____ im, spas. Tu _____ yî?
Azad Ez jî baş ____, spas. Ev hevala min e. Navê _____ Rojda ye.
Serhat Merheba Rojda. Tu çawa yî?
Rojda _____ baş im, spas.

4- Li gorî bersivan pirsan binivîsin.

1- _____?
Navê min Bahoz e.
2- _____?
Ez ji Efr´n° me.
3- _____?
Na, ez ne ji Am¾dê me. Ez ji D° r´kê me.
4- _____?
Erê, ew Rojda ye.
5- _____?
Ew demjimêr e.
6- _____?
Ew Zozan e.
7- _____?
Na, ew ne Zîlan e. Ew Hêlîn e.
8- _____?
Erê, ev Zerya ye.

5- Bi peyvên li jêr hevokan çêkin.

1- Nav / min / Ronahî
_____
2- Ez / Tirbasip´
_____
3- Em / baş
_____
4- Ev / Diyar
_____
5- Na / ew / nexşe
_____

A - Xebata li ser peyvan

1- Li gorî wêneyan xaçepirsê dagirin.



2- Nêçîra peyv û komepeyvan

1. ***ŞEVBAŞ***
2. _____
3. _____
4. _____
5. _____
6. _____
7. _____
8. _____
9. _____
10. _____
11. _____

A	**Ş**	**E**	**V**	**B**	**A**	**Ş**	T	Ş	D
P	I	R	T	Û	K	O	U	E	A
M	O	I	R	O	J	B	A	Ş	U
A	E	C	D	Ç	F	R	T	L	X
M	Û	D	A	M	A	S	E	Ê	Y
O	L	Ê	N	Û	S	K	K	T	J
S	X	W	E	N	D	E	K	A	R
T	R	A	Y	W	K	L	M	D	T
E	K	I	L	S	P	Î	K	L	D
B	I	X	J	Ê	B	I	R	T	E
A	O	E	S	P	A	S	S	I	P

B- Bikaranîna zimên

1- Cihên vala dagirin.

Perwîn Rojbaş!. _____ min Perwîn ___. Navê te ____ ye?
Pêlîn Navê ____ Pêlîn e.
Perwîn Pêlîn tu ji ____ derê ___?
Pêlîn Ez ___ Girk° Leg° ____. Lê tu?
Perwîn Ez ___ Gir° Sp´ ____.
Pêlîn Ez ___ nasîna te _____ bûm.
Perwîn Ez ___.

2- Cihên vala dagirin.

Pelşîn Êvarbaş!
Perwîn _____, Pelşîn!
Pelşîn Tu _____ yî?
Perwîn ____ baş ____. Lê tu?
Pelşîn ____ jî _____ im .

3- Hevokên her du koman ên ku hev temam dikin bigihînin hev.

1. Rojbaş!
2. Navê te çi ye?
3. Ez bi nasîna te kêfxweş bûm.
4. Tu çawa yî?
5. Tu ji ku derê yî?

a. Ez ji Req° me.
b. Ez jî.
c. Ez baş im.
d. Rojbaş!
e. Navê min Sernaz e.

1	2	3	4	5
d				

4- Cihên vala dagirin.

Dîlan Ev ____ ye?
Azad Ev Lezgîn ____.

Pelda Tu _____ yî?
Pelşîn Ez _____ im.

Dîlan Tu _____ î?
Azad Belê, ez Azad ___.

Dîlan _____ kî ye?
Azad Ew Bêrîvan ____.

Evîn Ew Rizgar e?
Şervan Na, _____ ne _____ e.

Dîlan _____ kî ne ?
Azad Ew _____ û Şervan in.

5- Cihên vala dagirin.

Dîlan Ev ____ ye?
Azad Ev mase ye.

Dîlan Ev ____ ye ?
Azad Ev lênûsk ____.

Evîn Ev çi ____?
Şervan ____ pênûs in.

Dîlan Ew çi ____?
Azad ____ pirtûk in.

Dîlan Ew çi ____ ?
Azad ____ pênûs e.

6- Pirsên bersivên li jêr binivîsin.

1. _____? Navê min Eg´d e.
2. _____? Ez Berdan im.
3. _____? Ez ji Koban° me.
4. _____? Lezgîn ji Am¾dê ye.
5. _____? Ew mizgeft e.
6. _____? Ev lênûsk e.
7. _____? Em ji Efr´n° ne.
8. _____? Ew Lezgîn e.
9. _____? Ev Gulbîn e.
10. _____? Ew pirtûk in.

7- Cihên vala bi “ e” an jî “ye” dagirin.

Rojda Navê min Rojda ____.
Polat Navê min Polat ____.
Dilêr Navê min Dilêr ____.
Berfîn Navê min Berfîn ____.
Besna Navê min Besna ____.
Delal Navê min Delal ____.

8- Cihên vala dagirin.

1. Ez nexweş im.
2. Tu nexweş ____.
3. Ew nexweş ____.
4. Em nexweş ____.
5. Hûn nexweş ____.
6. Ew nexweş ____.

9- Cihên vala dagirin.

1. Ez gundî me.
2. Tu gundî ____.
3. Ew gundî ____.
4. Em gundî ____.
5. Hûn gundî ____.
6. Ew gundî ____.

A- Hejmar

Tu çend salî yî?

1- Pirsên jêrîn li gorî diyaloga li rex bibersivînin.

1. Hêlîn çend salî ye?

_____

2. Dîlan çend salî ye?

_____

2- Du heval bên bal hev diyaloga li jêr li gorî xwe dagirin.

A _____, tu çend salî yî?
B Ez _____ salî me. Lê tu?
A Ez _____ salî me.

Hejmar

30 (sih) **40** (çil) **50** (pêncî) **60** (şêst) **70** (heftê) **80** (heştê) **90** (not) **100** (sed)

Hîndarî

1- Navên hejmaran li hemberî wan binivîsin.

1- 23 _____	5- 39 _____	9- 62 _____
2- 35 _____	6- 78 _____	10- 81 _____
3- 47 _____	7- 53 _____	11- 100 _____
4- 48 _____	8- 96 _____	12- 15 _____

2- Cihên vala li gorî rêzê dagirin.

1- sê, şeş, _____, dozdeh, pazdeh, _____, bîst û yek, _____

2- heft, _____, bîst û yek, _____ sih û pênc, _____

3- Deh, _____, sih, _____ pêncî, _____

4- Dozdeh, _____ sih û şeş, _____ şêst, _____

5- Pênc, _____ pazdeh, _____ bîst û pênc, _____ Sih û pênc _____

3- Cihên vala dagirin.

Dîlan Rojbaş! Navê _____ Dîlan e.
Navê te _____ ye?

Dilhat Navê min Dilhat _____.

Dîlan Tu ji ku _____ yî Dilhat ?

Dilhat Ez ji Bilbilê _____ Lê tu?

Dîlan Ez jî _____ Kobanê me.

Dilhat Dîlan tu _____ salî yî?

Dîlan Ez hejdeh _____ me.

Nivîs

Li gorî agahiyên li jêr hevokan saz bikin.

_____

_____

_____

B- Kar û pîşe

Ez mamoste me.

Ez endazyar im.

Ez karker im.

Ez bijîşk im.

Ew avahîsaz e.

Ew wênekêş e.

Tu çi karî dikî?

Hîndarî

1- Li gorî wêneyan pirsan bibersivînin.

1- Ew çi karî dike?

_____

2- Ew stranbêj e?

_____

_____

3- Ew çi karî dike?

_____

4- Ew ajokar e?

_____

_____

5- Ew dadger e?

_____

6- Ew çi karî dike?

_____

2- Li gorî agahiyên li jêr pirsan bibersivînin.

Navê min Ciwan e. Ez ji Qamîşlo me. Ez sih salî me. Ez karmend im.

1- Navê wî çi ye?

_____

2- Ew ji ku derê ye?

_____

3- Ew çend salî ye?

_____

4- Ew çi karî dike?

_____

3- Li gorî bersivên li jêr pirsan binivîsin.

1- _____

Ferzende şêwirmend e.

2- _____

Navê wê Delal e.

3- _____

Ew bîst salî ye.

4- _____

Ew ji Sêrtê ye.

Nivîs

Valahiyên li jêr li gorî xwe dagirin.

Nav :_____

Bajar :_____

Temen :_____

Pîşe :_____

Li gorî van agahiyan nivîsekê binivîsin.

Navê min _____

_____

_____

_____

C- Cih

Li ku derê ye?

Dîlan li malê ye.

Gul di guldankê de ne.

Pirtûk li ser maseyê ne.

Azad li ber paceyê ye.

Kursî li rex maseyê ye.

Dibistan li hember mizgeftê ye.

Pisîk di bin maseyê de ye.

1- Li gorî hevokên li jor pirsan bibersivînin.

1- Dîlan li ku derê ye?

_____

2- Çi li ser maseyê ne?

_____

3- Kî li ber paceyê ye?

_____

4- Çi di bin maseyê de ye?

_____

5- Dibistan li ku derê ye?

_____

daçek

ji	Şermîn ji Bazîdê ye.
li	Ronahî li Amedê ye.
li ser	Çivîk li ser darê ne.
li ber	Zarok li ber malê ne.
li rex	Dibistan li rex dêrê ye.
li hember	Ew li hember zanîngehê ye.
di …….de	Xwendekar di fêrgehê de ne.
di bin…..de	Lênûsk di bin pirtûkê de ye.

D- Heye / Hene

Li ser maseyê çenteyek heye.
Li ber malê darek tune ye.
Li ber paceyê zarokek heye.
Li ser darê çivîkin hene.
Di pirtûkxaneyê de pirtûkin hene.
Di fêrgehê de xwendekar tune ne.
Li ser maseyê du pênûs hene.

Qertafên nebinavkirinê	Mînak
-ek (yekjimar)	Zarokek, pirtûkek, pênûsek, darek
-in (pirjimar)	Zarokin, pirtûkin, pênûsin, darin

1- Li gorî hevokên li jor pirsan bibersivînin

1- Li ser maseyê çi heye?

_____

2- Li ber paceyê kî heye?

_____

3- Di pirtûkxaneyê de çi hene?

_____

4- Di fêrgehê de çend xwendekar hene?

_____

2- Li gorî wêneyê cihên vala bi heye / hene dagirin.

1- Du nivîn _____.
2- Avîzeyek _____.
3- Sê lembeyên şevê _____.
4- Du pace _____.
5- Paldankek _____.
6- Du balgîv _____.
7- Televîzyonek _____.



A - Xebata li ser peyvan

1-Xaçepirs



2- Hejmarên li jêr bi nivîsê binivîsin.

1	_____	12	_____
4	_____	15	_____
8	_____	58	_____
11	_____	13	_____
17	_____	72	_____
5	_____	89	_____
22	_____	94	_____
7	_____	14	_____
31	_____	19	_____
9	_____	100	_____
46	_____	20	_____
18	_____	60	_____

B- Bikaranîna zimên

1-Cihên vala dagirin

Şermîn Rojbaş, navê min Şermîn e. Navê _____ çi ye?
Hêlîn Rojbaş Şermîn, navê _____ Hêlîn e.
Şermîn Tu ji ku derê _____?
Hêlîn Ez _____ Efrînê me, lê tu?
Şermîn Ez ji Qamîşlo _____.
Hêlîn Tu _____ karî dikî?
Şermîn Ez rojnamevan _____. Tu çi karî dikî?
Hêlîn _____ xwendekar im.
Şermîn Tu _____ salî yî Hêlîn?
Hêlîn Ez hevdeh _____ me.

2- Pirs û bersivên li jêr bigihînin hev.

1- Navê te çi ye?
2- Hûn ji ku derê ne?
3- Berfîn çend salî ye?
4- Tu çi karî dikî?
5- Li ser maseyê çi heye?
6- Li ber malê kî heye?
7- Zarok li ku derê ne?
8- Di guldankê de çend gul hene?
9- Li hember dêrê çi hene?

a- Di guldankê de çar gul hene.
b- Li ser maseyê kompîturek heye.
c- Navê min Berzo ye.
d- Zarok li dibistanê ne.
e- Em ji Qersê ne.
f- Ew bîst salî ye.
g- Ez karker im.
h- Li ber malê ciwanek heye.
i- Li hember dêrê darin hene.

1	2	3	4	5	6	7	8	9
c								

3- Cihên vala bi heye / hene dagirin.

1- Li ber dibistanê darin _____.
2- Li ser darê çivîkek _____.
3- Di malê de pênc mêvan _____.
4- Di kargehê de deh karker _____.
5- Di koxikê de mirîşkek _____.

4- Cihên vala bi qertafên nebi-navkirinê (-ek / -in) dagirin.

1- Li taxê dibistan___ heye.
2- Di pirtûkxaneyê de pirtûk___ hene.
3- Li bin darê zilam___ heye.
4- Li malê mirov___ hene.

un te 3 MALBAT

- Danasîna malbatê
- Danasîna kesan
- Spartek

A- Danasîna malbatê

Ev xaltîk**a** min e.
Navê wê Evîn e.

Ev dotmam**a** min e.
Navê wê Xunav e.

Ev ap**ê** min e. Navê
wî Ferzende ye.

Ev met**a** min e.
Navê wê Kewê ye.

Ev xal**ê** min e.
Navê wî Sertac e.

Ev xwişk**ên** min in.
Navên wan Dîlan û Pelîn in.

Veqetandek	Mînak
-a (yekjimar-mê)	Met**a** min
-ê (yekjimar-nêr)	Bav**ê** min
-ên (pirjimar)	Xwişk**ên** min

1- Cihên vala li gorî agahiyên her du rûpelên pêşîn dagirin.

bûra	tî	hevjîn	bapîr	birazî	keç	law	nevî
bûk	nevî	xwarzî	xwişk				

1) Bozo _____ Dîlan**ê** ye.

2) Serhat ___ Ferzende**yî** ye.

3) Dilşa _____ Gul**ê** ye.

4) Sertac _____ Rodi**yî** ye.

5) Pelîn _____ Qenco**yî** ye.

6) Dîlan _____ Sertac**î** ye.

7) Kewê _____ Rodi**yî** ye.

8) Ferzende ____ Dilşa**yê** ye.

9) Gulê _____ Bozo**yî** ye.

10) Dîlan, Pelîn û Serhat _____ Gulêê ne.

11) Ferzende û Rodî _____Bozoyî ne.

12) Dîlan û Pelîn _____
Rodiyî ne.

Tewang

Qertafên tewangê	Mînak
-ê (mê-yekjimar)	Bavê Dîlan**ê** parêzer e. Bavê wê parêzer e.
-î (nêr-yekjimar)	Diya Serhat**î** bijîşk e. Diya wî bijîşk e.
-an (pirjimar)	Keça mêvan**an** nexweş e. Keça wan nexweş e.

2- Cihên vala qertafên tewangê dagirin.

1- Apê Sosin__ nivîskar e.

2- Dayika Bager__ mamoste ye.

3- Rojda hevala Dîlan__ ye.

4- Azad hevalê Diyar__ ye.

5- Xaniyên cîran__ mezin e. (pirjimar)

6- Goga zarok__ sor e. (pirjimar)

Malbata Dîlanê

Di mala me de heft kes hene. Diya min, bavê min, xwişka min, birayê min, dapîr û bapîrê min û ez. Navê bavê min Rodî ye. Ew parêzer e. Navê diya min Dilşa ye. Ew bijîşk e. Navê birayê min Serhat e. Ew xwendekar e. Navê xwişka min Pelîn e. Ew hîn piçûk e. Navê bapîrê min Bozo ye, navê dapîra min jî gul ye.

3- Pirsên jêrîn li gorî diyaloga jorîn bibersivînin.

1) Di mala Dîlanê de çend kes hene?

_____

2) Rodî kî ye?

_____

3) Navê diya Dîlanê çi ye?

_____

4) Çend xwişk û birayên Dîlanê hene?

_____

5) Navê dapîra Dîlanê çi ye?

_____

6)Bozo kî ye?

_____

Nivîs

Li gorî pirsên li jêr malbata xwe bidin nasîn.

1- Di mala we de çend kes hene?
2- Navên wan çi ne?
3- Ew çend salî ne?
4- Ew çi karî dikin?

Biray**ekî** min heye. Navê wî Ciwan e.

Xwişk**eke** min heye. Navê wê Kewê ye

Çend xwişk û birayên te hene?

Diyar Çend xwişkên te hene?
Azad Sê xwişkên min hene.
Diyar Çend birayên te hene?
Azad Birayekî min heye. Çend xwişk û birayên te hene?
Diyar Xwişkek û du birayên min hene.

4- Pirsên jêrîn li gorî diyaloga jorîn bibersivînin.

1. Çend xwişkên Azad hene?
   _____
2. Çend birayên Azad hene?
   _____
3. Çend xwişk û birayên Diyar hene?
   _____

Veqetandekên nebinavkirî	Mînak
-eke (mê/yekjimar)	Xwişk**eke** min heye.
-ekî (nêr/yekjimar)	Biray**ekî** min heye.
-ine (pirjimar)	Heval**ine** min hene.

5- Cihên vala dagirin.

1- **Dilba** Çend xwişkên _____ hene?
Gulbîn Du xwişkên min _____
Dilba _____ xwişkên te çi ne?
Gulbîn Navê yekê Bihar, _____ ya din jî Berfîn e.

2- **Dilba** Çend birayên te _____?
Gulbîn Birayekî _____ heye.
Dilba _____ birayê te çi ye ?
Gulbîn Navê _____ min Hogir e.

3- **Rojda** Çend xwişk û birayên te _____?
Zînê Du xwişkên _____ hene, lê birayên min tune ne.
Rojda Navên wan çi _____?
Zînê Navên wan Delal û Asmîn ____.

Malbata Delalê

Navê min Delal e. Ez xwendekar im. Ez deh salî me. Diya min mamoste ye. Navê wê Sosin e. Ew çil û heşt salî ye. Bavê min bazirgan e. Navê wî Hogir e. Ew pêncî û pênc salî ye.

Du birayên min hene. Birayekî min bijîşk e. Navê wî Bahoz e. Ew bîst û heşt salî ye. Birayekî min jî rojnamevan e. Navê wî Aso ye. Ew bîst û şeş salî ye.

Apekî min heye, navê wî Sîdar e, ew ajokar e. Dotmameke min heye. Navê wê Şîlan e. Ew hunermend e. Du pismamên min hene. Pismamekî min karker e, navê wî Hozan e. Pismamekî min jî firoşkar e. Navê wî Menal e.

6- Pirsên jêrîn li gorî nivîsa li jor bibersivînin.

1. Sosin çi karî dike?

_____

2. Hogir çend salî ye?

_____

3. Çend birayên Delalê hene?

_____

4. Aso çi karî dike?

_____

5. Navê dotmama Delalê çi ye?

_____

6. Çend kurên Sîdarî hene?

_____

7- Li gorî nivîsa jorîn cihên vala bi navên pîşeyan dagirin.

1- Sosin _____ ye.
2- Hogir _____ e.
3- Bahoz _____ e.
4- Aso _____ e.
5- Sîdar _____ e.
6- Şîlan _____ e.
7- Hozan _____ e.
8- Menal _____ e.

Kî / Kê

8- Pirsên van bersivan bi kî / kê binivîsin.

Mînak

Bavê Delalê kî ye? Bavê Delalê Hogir e.
Hogir bavê kê ye? Hogir bavê Delalê ye.

1- _____?
Sosin diya Delalê ye.
2- _____?
Delal xwişka Bahozî ye.
3- _____?
Aso kurê Hogirî ye.
4- _____?
Şîlan keça Sîdarî ye.

B- Danasîna kesan

Reng û dirûv





Ev jinapa min e. Navê wê Gulnaz e. Ew jineke dirêj û bejnzirav e. Porê wê xingalî ye. Çavên wê şîn in.

Ew jineke jîr e.

Ev pismamê min e. Navê wî Şivan e. Ew xortekî kurt û xwîngerm e. Ew porkurîşk û çavreş e. Şivan xortekî jîr û jêhatî ye.

Ev hevjînê meta min e. Navê wî Bawer e. Ew zilamekî navsere ye. Porê wî qehweyî ye. Çavên wî hingivîn in. Ew mirovekî zarşîrîn e.

Ev keça meta min e. Navê wê Nalîn e. Ew keçeke çavşîn e. Porê wê zer û pêldar e. Ew keçek rûgeş û zana ye.

1- Pirsên li jêr li gorî nivîsan bibersivînin.

1- Çavên Gulnazê çi reng in?

_____

2- Porê Şivanî çawa ye?

_____

3- Kî kurt û xwîngerm e?

_____

4- Çavên kê hingivîn in?

_____

5- Kî zarşîrîn e?

_____

6- Porê kê qehweyî ye?

_____

Nivîs

Hûn jî hevalekî/e xwe bidin nasîn.

Çav	Por	Bejn	Xûy	Taybetî
çavreş çavşîn çavhingivîn çavzer	xingalî şitî kurîşk	dirêj kurt/kin	xwîngerm zarşîrîn rûgeş	jîr jêhatî zana

Hîndarî

1- Valahiyên nivîsara li jêr temam bikin û bixwînin.

Navê min Zozan ___. Ez rojnamevan ___. Diya min bijîşk e. Bavê ___ dîrokzan ___. Du xwişkên min _____. Xwişka _____ a mezin endazyar e. Xwişka min a biçûk jî xwendekar ___. Apê _____ wêjevan e. Meta min mamoste ____. Dotmama _____ wênesaz e. Pismamekî min _____, ew jî nivîskar e.

2- Ji hevokên li jêr ji bo yên rast stûna (r) ji bo yên çewt stûna (ç) xêz bikin.

	Hevok	r	ç
1	Zozan xwendekar e.		✓
2	Diya Zozanê endazyar e.		
3	Bavê Zozanê dîrokzan e.		
4	Xwişka Zozanê bijîşk e.		
5	Apê Zozanê wêjevan e.		
6	Dotmama Zozanê hunermend e.		
7	Pismamê Zozanê nivîskar e.		

3- Cihên vala bi veqetandekên binavkirî (-a, -ê, -ên) dagirin.

1- Xwîşk___ min biçûk e.
2- Bira___ min mezin e.
3- Rustem___ Zal pehlewan e.
4- Kawa___ Hesinker serhildêr e.
5- Heval___ min zîrek in.
6- Sê bira___ min hene.
7- Ap___ min ajokar e.
8- Met___ wê perestar e.
9- Xal___ min karsaz in.
10- Bira___ min xwendekar in.
11- Pismam___ min karker in.
12- Bav___ wî endazyar e.
13- Bira___ min bijîşk e.
14- Dotmam___ min hunermend e.

4- Cihên vala bi veqetandekên nebinavkirî (-eke, -ekî, -ine) dagirin.

1- Xwîşk____ min heye.
2- Bira____ te heye.
3- Delal keç____ çardehsalî ye.
4- Malbata Delalê di xanî____ biçûk de rûdinê.
5- Xal____ Delalê heye.
6- Met____ Delalê heye.
7- Heval____ Delalê pir baş in.
8- Xwişk____ Zînê heye.
9- Bira____ Tacdîn heye.
10- Beko fesad____ pir xirab e.
11- Tacdîn heval____ fedakar e.

A- Xebata li ser peyvan

1- Nêçîra peyvan

1. *DAPÎR*.....
2.....
3.....
4.....
5.....
6.....
7.....
8.....
9.....
10.....
11.....
12.....
13.....

D	R	B	Z	S	T	A	B	Q	X
A	X	A	L	W	Q	P	I	L	B
P	W	V	A	R	M	R	R	Y	E
Î	I	S	D	D	E	K	A	G	X
R	Ş	M	O	S	T	E	Q	W	D
W	K	E	T	R	T	Ç	T	Y	Ê
Z	K	X	M	C	B	A	P	Î	R
X	R	L	A	W	C	V	B	N	A
Q	W	E	M	R	T	Y	U	P	R
P	I	S	M	A	M	D	F	G	H
W	X	A	L	T	Î	O	Ş	N	M

2- Hevokên her du koman yên hev û du temam dikin bigihînin hev.

1. Xwişka bavê mirov
2. Keça apê mirov
3. Xwişka diya mirov
4. Birayê dayika mirov
5. Pismamê mirov

a. xalê mirov e.
b. meta mirov e.
c. xaltîka mirov e.
d. dotmama mirov e.
e. lawê apê mirov e.

1	2	3	4	5
b				

B- Xwendin û bikaranîna zimên

Malbata Bahozî

1- Nivîsa li jêr bixwînin û pirsan bibersivînin.

Navê min Bahoz e. Ez ji Qamîşlo me. Ez hevdeh salî me. Ez xwendekar im. Porê min reş û kurîşk e. Çavên min reş in. Ez dirêj û bejnzirav im.

Navê diya min Besna ye. Ew mamoste ye. Ew çil salî ye. Porê wê zer û kurt e. Çavên wê şîn in. Ew jineke xweşik e.

Bavê min zilamekî dirêj e. Navê wî Rojhat e. Ew karmend e. Ew çil û du salî ye. Porê wî qehweyî ye. Çavên wî reş in.

Du xwişkên min hene. Navên wan Zelal û Delal in. Lê belê qet birayên min tune ne.

Zelal yazdeh salî ye. Ew xwendekar e. Ew porzer û çavşîn e. Delal neh salî ye. Ew bejnkurt e.

Bapîrê min şêst û du salî ye. Navê wî Ehmed e. Çavên wî reş in. Navê dapîra min Zîn e. Ew jineke qelew e.

1- Bahoz ji ku derê ye? _____

2- Ew çend salî ye? _____

3- Ew çi karî dike? _____

4- Çavên Bahozî çi reng in? _____

5- Bahoz kurekî dirêj e? _____

6- Besna kî ye? _____

7- Porê Besnayê çawa ye? _____

8- Rojhat bavê kê ye? _____

9- Çavên Rojhatî çi reng in? _____

10- Zelal û Delal kî ne? _____

Malbata Zelalê

2- Di nivîsa li jêr de cihên vala bi cînavk û qertafên kesane dagirin.

Navê min Zelal e. ____ ji Amûdê me. Ez çardeh salî ____. Çavên ____ reş in. Porê min şitî û reş ____.
Navê bavê min Rojan e. ____ çil salî ____. Ew zîv-ker e. Çavên ____ reş in. Porê wî qehweyî ____. Ew kin û qelew e. Bavê min zilamekî çeleng e.
Navê diya min Zîn e. Ew çil û sê salî ____. Ew ber-malî ye. Çavên ____ hingivîn in. Porê wê xingalî ye. ____ kurt e. Diya min jineke rûgeş e.
Du birayên min hene. Navên ____ Rûbar û Kawa ne. Rûbar sêzdeh salî ye. ____ xwendekar e. Ew çavşîn ____. Kawa yek salî ____. Çavên ____qehweyî ne.

3- Di nivîsa li jêr de veqetandekan bi cih bikin.

Nav___ dapîr___ min Zerya ye. Ew şêst û pênc salî ye. Por___ wê şitî ye. Çav___ wê reş in. Ew qelew e. Bapîr___ min şest û çar salî ye. Nav___ wî Ziya ye. Çav___ wî qehweyî ne.
Ap___ min heye. Navê wî Sîdar e. Ew parêzer e. Ew zilam___ çeleng e. Navê amo-jin___ min Narîn e. Ew rojnamewan e. Ew gelekî xwîngerm e. Pismam___ min heye. Nav___ wî Bager e. Ew deh salî ye. Ew çavşîn e. Ew kur___ şermok e. Navê dot-mam___ min Xûnav e. Ew keç___ xwîngerm e.

Nivîs

Hûn jî der heqê malbata xwe nivîsekê binivîsin.

4- Valahiyan bi veqetandekan (-a, -ê, ên, -eke, -ekî, -ine) dagirin.

1- Navê Ap___ min Ferhat e.
2- Çav___ xwişk___ min reş in.
3- Du bira___ min hene.
4- Xwişk___ Avşînê heye.
5- Xanî___ me heye.
6- Çar pênûs___ min hene.
7- Çente___ min reş e.
8- Mal___ me mezin e.
9- Zozan jin___ jîr e.
10- Ronî kur___ çeleng e.

5- Cihên vala bi qertafên tewangê dagirin. (-ê, -î, -an)

1- Bavê Hogir___ bazirgan e.
2- Diya Evîn___ bermalî ye.
3- Li Dêrikê darên gûz___ hene.
4- Çavên Xezal___ reş in.
5- Keça mêvan___ newxeş e.

6- Bi peyvên li jêr hevokan çêkin.

1- Jêhat / xort / çeleng _____
2- Por / Zerya / dirêj _____
3- Ew / kur / jîr _____
4- Ap / min / zilam / zana _____
5- Rohîv / jin / bedew _____
6- Bav / heval / min / parlamenter _____
7- Hevser / xwişk / min / çeleng _____
8- Bira / wê / mirov / hêja _____
9- Tu / jin / çalak _____
10- Sosin / keç / xwîngerm _____

7- Di nivîsa li jêr de binê veqetandekan xêz bikin.

Navê min Aldar e. Ez mamoste me. Ez sî û du salî me. Ez ji Efr´n° me. Efr´n navçeyeke mezin e. Li Efr´n° darênZeyt¾n û hinaran hene. Li Efr´n° ziyaretek mezin heye.
Navê wê Ziyareta Hen°n e.
Keçeke min heye. Navê keça min Berçem e. Ew deh salî ye. Du kurên min hene. Navên wan Hozan û Şerzan in. Hevjîna min bijîşk e. Navê wê Rojîn e. Ew jineke jîr û jêhatî ye.

Nivîs

Li gorî agahiyên li jêr nivîsekê binivîsin.

Nav: Hogir, **Pîşe:** bazirgan, **Bajar:** Midyad / dîrokî, **Zarok:** du kur; Ferat, Bawer, **Hevjîn:** dirûnker

Navê min _____
_____
_____
_____

A- Çalakiyên rojane

Tu çi dikî





Dema Niha

cînavk	qertafa dema niha	rayek	qertafa kesane	hevok
Ez	di	ç	im	Ez diçim / naçim.
Tu			î	Tu diçî / naçî.
Ew			e	Ew diçe / naçe.
Em			in	Em diçin / naçin.
Hûn			in	Hûn diçin / naçin.
Ew			in	Ew diçin / naçin.

Dîlan çi dike?

Forma neyînî ya dema niha

lêker	qertafa dema niha	pêşgir	rayek	qertafa kesê/a yekemîn	forma dema niha	neyîniya dema niha
bûn	di		b	im	dibim	nabim
anîn			în		tînim (dihînim)	nayînim
hêlan			hêl		dihêlim	nahêlim
gotin			bêj		dibêjim	nabêjim
xwarin			xw		dixwim	naxwim
hatin			hê		têm	nayêm
xwendin			xwîn		dixwînim	naxwînim
lîstin			lîz		dilîzim	nalîzim
şûştin			şo		dişom	naşom
gerîn			ger		digerim	nagerim
kirîn			kir		dikirim	nakirim
kişandin			kişîn		dikişînim	nakişînim
rabûn		ra	b		radibim	ranabim
vekirin		ve	k		vedikim	venakim
raketin		ra	kev		radikevim	ranakevim
wergerandin		wer	gerîn		werdigerînim	wernagerînim

1- Diyalogê bixwînin û pirsan bibersivînin.

Dilşa Keça min, tu çi dikî?
Dîlan Ez spartekên xwe çêdikim.
Dilşa Baş e. Pelîn çi dike?
Dîlan Ew li odeya xwe ye, wêneyan xêz dike. Meta min li vir e. Ew û bavê min li televîzyonê temaşe dikin.
Dilşa Serhat li malê ye?
Dîlan Belê, ew jî rojnameyê dixwîne.
Dilşa Baş e. Ez jî di rê de me, têm malê. Daxwazeke we heye?
Dîlan Na, spas.

1- Dîlan bi kê re diaxive?

_____

2- Pelîn çi dike?

_____

3- Bavê Dîlanê çi dike?

_____

4- Kî rojnameyê dixwîne?

_____

5- Dilşa diçe ku derê?

_____

6- Dîlan xwarinê çêdike?

_____

7- Pelîn wêneyan xêz dike?

_____

8- Meta Dîlanê tirşikê çêdike?

_____

9- Serhat rojnameyê dixwîne?

_____

10- Dilşa bi Serhatî re dipeyive?

_____

Tewang

Qertafên tewangê	Mînak:(binavkirî)	Mînak:(nebinavkirî)
/-ê (mê)	Ez dar**ê** dibînim.	Ez dar**ekê** diçinim.
/-î (nêr)	Ew nan**î** dixwe.	Ew nan**ekî** dikire.
/-an (pirjimar)	Em heval**an** dibînin.	Ew heval**inan** dibînin.

1- Ez av**ê** vedixwim.
2- Ew firavîn**ê** dixwe.
3- Ew Zozan**ê** dibîne.
4- Ew nan**î** dixwe.
5- Tu Azad**î** dibînî?
6- Ew gul**an** bêhn dike.
7- Em li zarok**an** dinêrin.

Hîndarî

1- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî dema niha bikişînin

Azad Dîlan, tu li ku derê yî?
Dîlan Ez li mala Hêlînê me. Rojda û Diyar jî li vir in.
Azad Baş e. Hûn çi _____ (kirin)?
Dîlan Ez û Hêlîn li waneya dîrokê _____ (xebitîn). Rojda nameyekê _____ (nivîsîn). Diyar jî rojnameyê _____ (xwendin). Tu jî _____ (hatin)?
Azad Erê, ez jî _____ (hatin) Gelo xwarin heye?
Dîlan Erê, diya Hêlînê ji me re xwarinê _____ (çêkirin).
Azad Baş e. Ez jî ava fêkiyan _____ (anîn).

2- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî dema niha bikişînin.

1- Rojîn sêvekê _____ (xwarin)
2- Tu çayê _____? (vexwarin)
3- Azad _____ dibistanê. (çûn)
4- Em li fîlmekî temaşe _____ (kirin)
5- Ez _____ (na/raketin)
6- Em _____ (na/gerîn)
7- Rojda gulan _____(na/çinîn)
8- Pelên daran _____(weşîn)
9- Ez cilan _____ (şûştin)

3- Li gorî mînakan bersivan binivîsin.

Mînak
Serdar pirtûkê dixwîne?
Erê, Serdar pirtûkê dixwîne.

Rojîn çayê vedixwe? (av)
Na, Rojîn çayê venaxwe. Ew avê vedixwe.

1- Hûn diçin malê? (kargeh)
Na, _____
2- Zozan çîrokan dibêje? (helbest)
Na, _____
3- Tu nameyekê dinivîsî?
Erê, _____
4- Zarok ji dibistanê tên?
Erê, _____
5- Hêlîn bi Azadî re dipeyive?(Diyar)
Na, _____

4- Li gorî mînakê bersivan binivîsin.

Mînak: *Tu diçî ku derê?(dibistan)*
Ez diçim dibistanê.

1- Bahoz çi dişo? (cil)
_____
2- Zelal bi kê re diaxive? (Sertac)
_____
3- Bager ji ku derê tê? (şano)
_____
4- Tu çi dixwî? (nan)
_____
5- Zarok çi dilîzin? (futbol)
_____
6- Kî stranan dibêje? (Delal)
_____

B- Rojeke Dîlanê

Dîlan her roj serê sibehê zû radibe.
Serçavên xwe dişo.
Taştêya xwe dixwe.
Piştre, ew bi serwîsê diçe dibistanê.
Waneyên wê nîvro diqedin.
Dîlan ji dibistanê derdikeve, tê malê.
Ew firavîna xwe li malê dixwe.
Paşê derdikeve derve û heta berêvarê dema xwe bi çalakiyên cihêreng der-bas dike. Paşê dîsa vedigere malê.
Tevî malbata xwe şîvê dixwe.
Spartekên xwe çêdike, hinekî li televîzyonê temaşe dike û radikeve.

1- Pirsên jêrîn li gorî nivîsa jorîn bibersivînin.

1. Dîlan kengî radibe?

_____

2. Dîlan piştî ku serçavên xwe dişo, çi dike?

_____

3. Waneyên Dîlanê kengî diqedin?

_____

4. Dîlan firavînê li ku dixwe?

_____

5. Dîlan tevî kê şîvê dixwe?

_____

6. Dîlan kengî spartekên xwe çêdike?

_____

7. Piştî spartekan ew çi dike?

_____

daçek

Li	Ez **li** Amûdê dijîm.
	Ew firavînê **li** malê dixwe.
Bi	Dîlan **bi** serwîsê diçe dibistanê.
	Serhat **bi** diya xwe re dipeyive.
Ji	Ez **ji** malê têm.
	Berfîn **ji**Kobanê ye.
	Ew **ji** muzîkê hez dike.

C- Bernameya Dîlanê ya heftane

Dîlan ji çalakiyên hunerî û werzîşî pir hez dike. Lewma jî ew beşdarî gelek çalakiyan dibe. Ew roja duşemê diçe avjeniyê. Roja sêşemê ew beşdarî xebatên şanoyê dibe. Dîlan roja çarşemê li malê dimîne û karên malê dike. Ew roja pêncşemê dema xwe bi hevalên xwe re derbas dike. Roja înê diçe kursa gîtarê. Dawiya hefteyê jî bi malbata xwe re diçe serdana xizmên xwe.

1- Pirsên jêrîn li gorî nivîsa jorîn bibersivînin.

1. Dîlan roja duşemê çi dike?

_____

2. Dîlan kîjan rojê beşdarî xebatên şanoyê dibe?

_____

3. Roja çarşemê Dîlan çi dike?

_____

4. Ew kîjan rojê dema xwe bi hevalên xwe re derbas dike?

_____

5. Dîlan roja înê diçe kursa çi?

_____

Lêkerên Hevedudanî

beşdar bûn	Ez her sibe beşdarî civînê dibim.
hişyar bûn	Ew her roj di heftan de hişyar dibe.
amade kirin	Ew her sibe taştêyê amade dike.
hişyar kirin	Bavê min her sibe me hişyar dike.
avjenî kirin	Ez her hefte avjeniyê dikim.
derbas kirin	Em betlaneya xwe li ber zeryayê derbas dikin.
xêz kirin	Ew wêneyan xêz dike.
li _____ temaşe kirin	Ez li nûçeyan temaşe dikim.
li _____ nêrîn	Ew li zarokan dinêre.
li _____ guhdarî kirin	Ez li stranan guhdariyê dikim.
li _____ siwar bûn	Em li keştiyê siwar dibin.
li _____ dan	Ew li tembûrê dide.
dest pê kirin	Karê me di dehan de dest pê dike.

Hîndarî

Navê min Zelal e. Ez bijîşk im. Ez bi meta xwe re li Qamîşlo dijîm. Ez di nexweşxaneyeke taybet de dixebitim. Meta min sibehê zû radibe û min hişyar dike. Em bi hev re taştê dixwin. Piştre ez firaqan dişom û ji malê derdikevim. Nexweşxane nêzî mala me ye. Ez her sibe bi peyatî diçim nexweşxaneyê. Karê min di nehan de dest pê dike. Ez firavînê bi hevalên xwe re dixwim. Ez di şeşan de ji nexweşxaneyê derdikevim. Ez carinan hevalên xwe dibînim, carinan jî diçim mala birayê xwe. Em bi hev re şîvê dixwin. Bi êvaran ez qet li televîzyonê temaşe nakim. Bi piranî ez pirtûkan dixwînim an jî li muzîkê guhdariyê dikim. Rojên şemiyê ez diçim sûkê û pêdiviyên malê dikirim. Roja yekşemê jî carinan diçim şanoyê yan jî digerim.

1- Nivîsa li jor li gorî kesa sêyem ji nû ve binivîsin.

Navê wê Zelal e. _____

_____

_____

_____

_____

2- Di nivîsa li jêr de lêkeran li gorî dema niha bikişînin.

Ez mamoste me. Navê min Dildar e. Ez li Amûdê dijîm. Ez di dibistaneke mezin de _____ (xebitîn). Ez sibehê zû _____ (rabûn). Ez hevsera xwe hişyar _____ (kirin). Em taştê _____ (xwarin). Piştre ez _____ (çûn) dibistanê. Waneyên min di duyan de _____ (qedîn). Piştî dibistanê ez hevalên xwe _____ (dîtin). Ez di pêncan de _____ (gihaştin) malê. Ez rojnameyê _____ (xwendin). Ez şîvê _____ (çêkirin). Hevsera min Sosin, di şeşan de _____ (hatin) malê. Em şîvê _____ (xwarin). Piştî şîvê em carinan li televîzyonê temaşe _____ (kirin) û carinan jî pirtûkan _____ (xwendin).

Navê min Aldar e. Ez nivîskar im. Ez bi malbata xwe re li Bilbilê dijîm. Ez sibehan dereng radibim. Piştî taştê ez rojnameyan dixwînim. Piştre ez demekê li nûçeyan temaşe dikim. Berî êvarê ez carinan hevalên xwe dibînim û carinan jî li ber Behra Wanê digerim. Bi êvaran ez ji bo rojnameya RONAHÎ nivîsaran dinivîsim. Bi şev heta dereng ez li ser pirtûka xwe dixebitim.

3- Ji bo bersivên li jêr pirsan binivîsin.

1- _____? Aldar li Bilbilê dijî.

2- _____? Ew bi malbata xwe re dijî.

3- _____? Erê, ew sibehan dereng radibe.

4- _____? Ew piştî taştê rojnameyan dixwîne.

5- _____? Ew bi êvaran nivîsaran dinivîse.

Xwe

Ez bi malbata **xwe** re dijîm. / Ew spartekên **xwe** çêdike.

4- Lêkerên li jêr li gorî dema niha bikişînin.

1- Ew qet spartekên xwe _____ (çêkirin/na).
2- Delal qet _____ (westan/na).
3- Diya min her roj cilan _____ (şûştin).
4- Dapîra min her şev ji me re çîrokan _____ (vegotin).
5- Li vir qet berf_____ (barîn/na).
6- Em her sibe malê _____ (malaştin).
7- Tu li ku derê _____ (jîn)?
8- Em rojên şemiyê _____ (civîn).
9- Ez her sibe _____ (meşîn).
10- Tu qet stranan _____ (gotin)?

5- Hevokên li jêr li gorî xwe biqedînin.

1- Ez carinan _____
2- Ez tu carî _____
3- Ez her sibe _____
4- Ez bi êvaran _____
5- Ez rojên şemiyê _____
6- Ez rojên yekşemê _____

6- Ji hevokên li jêr yên ku ji bo we rast in hilbijêrin.

1- Ez her sibe zû radibim.
2- Ez tu carî taştê naxwim.
3- Ez pirî caran firavînê li derve dixwim.
4- Ez bi êvaran li televîzyonê temaşe dikim.
5- Ez qet naçim şanoyê.
6- Ez carinan diçim sînemayê.
7- Ez tu carî wêneyan xêz nakim.
8- Ez qet li muzîkê guhdariyê nakim.

Nivîs

Der heqê rojeke xwe de binivîsin.

Hokerên çendaniyê

qet, tu carî, hin caran, carinan, pirî caran, her tim, her sibe, her êvar

navên meh û demsalan

BIHAR	Adar	Avrêl	Gulan
HAVÎN	Pûşper	Tîrmeh	Gelawêj
PAYÎZ	Rezber	Kewçêr	Sermawez
ZIVISTAN	Berfanbar	Rêbendan	Reşemî

navên rojan

şemî yekşem duşem sêşem çarşem pêncşem în

danên rojê

Berbang	Beyanî	Nîvro	Berêvar	Êvar	Şev

danên xwarinê

Xurinî: Danê xwarinê yê yekemîn e.

Taştê: Xwarina serê sibehê ye.

Firavîn: Xwarina nîvro ye.

Şîv: Xwarina êvarê ye.

Paşîv: Xwarina nîvê şevê ye.

Demsal

Di demsala biharê de hewa hêdî hêdî germ dibe. Baran dibare û kulîlk vedibin. Jiyana biharê xweş e.

Zivistan sar e. Berf dibare. Av diqerise. Di zivistanê de jiyan zehmet e.



Havîn germ e. Li gundan dema paletiyê ye. Havînê fêkî digihêjin. Havîn dema betlaneyê ye.

Piştî havînê payîz tê. Hêdî hêdî hewa sar dibe. Dibistan vedibin. Pelên daran diweşin.

E- Saet


dibore


heye


nîv


çaryek dibore


çaryek heye

Saet çend e?


Saet sê ye.


Saet çar û çaryek e.


Saet ji çaran deh dibore. / Çar û deh deqe ye.

Saet çar û nîv e.


Saet ji şeşan re çaryek heye./ şeş kêm çaryek e.

Saet ji heştan pênc dibore./ Heşt û pênc deqe ye.


Saet ji heftan re deh heye./ Heft kêm deh deqe ye.


Saet dozdeh kêm çaryek e.


Saet ji heştan bîst dibore./ Heşt û bîst deqe ye.


Saet dozdeh e.

1- Li ber reqeman bi nivîsê saetê binivîsin.

7:05 : ..... 9:10: ..... 10:30:.....

7:08 : ..... 9:15: ..... 10:34:.....

8:09 : ..... 9:25: ..... 10:40:.....

Rojeke Azadî

Ez her roj serê sibehê saet di heftan de hişyar dibim. Ez diçim serşokê, ser çavên xwe dişom. Ez taştê dixwim, bi lez û bez ji malê derdikevim. Ez saet di heft û nîvan de li serwîsa dibistanê siwar dibim. Saet di heştan de em digihêjin dibistanê. Waneyên me saet di heşt û nîvan de dest pê dikin. Saet di dozdeh û nîvan de em navbera nîvro didin. Saet di yekê de em firavîna xwe li xwaringeha dibistanê dixwin. Saet diduyan de dîsa waneyên me dest pê dikin. Waneyên me piştî nîvro heta seat çaran didomin.

Ez saet di çar û nîvan de digihêjim malê. Ez gelek caran saet di pênc kêm çaryekê de ji malê derdikevim. Ez heta saet şeşan dema xwe bi hevalên xwe re li derve derbas dikim û paşê vedigerim malê. Êvarî seat di heftan de em şîvê dixwin. Ez ji heft û nîvan heta seat nehê şevê spartekên xwe çêdikim. Piştî wê ez heta seat yazdehan li televizyonê temaşe dikim. Piştî saet yazdehan ez pirtûkekê dixwînim û saet di dozdehan de radikevim.

2- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.

1- Azad saet di çendan de li serwîsê siwar dibe?

_____

2- Wane di çendan de dest pê dikin?

_____

3- Ew li ku firavînê dixwe.

_____

4- Azad saet di çendan de ji dibistanê vedigere malê?

_____

5- Ew saet di çendan de şîvê dixwin?

_____

6- Azad kengî li televizyonê temaşe dike?

_____

7- Azad saet ji heft û nîvan heta nehê şevê çi dike?

_____

8- Ew kengî radikeve?

_____

3- Reqemên saetan ên di nav kevanekê de wekî nivîs binivîsin.

Rojda saet di _____ (8:15) de hişyar dibe. Ew _____ (8:30) taştê amade dike. Rojda saet di _____ (9:00) taştê dixwe. Ew saet di _____ (9:30) de ji malê derdikeve, saet di _____(10:00) digihêje ser kar. Ew heta _____ (12:00) dixebite. Saet di _____ (12:10) ew firavînê dixwe. Rojda saet _____ (13:00) vedigere ser kar û heta saet _____ (17:00) dixebite. Ew piştî kar bi hevalên xwe re digere û saet di_____ (19:30) vedigere malê.

A - Xebata li ser peyvan

1- Cihên vala bi van peyvan dagirin.

payîz	sar	berf	fêkî	kulîlk	havîn

1- Demsala _____ ê germ e.
2- Di _____ ê de pelên daran diweşin.
3- Di biharê de _____ vedibin.
4- Di zivistanê de _____ û baran dibarin.
5- Sêv _____ ye.
6- Di zivistanê de hewa _____ e.

2- Navên mehan li gorî demsalan binivîsin

Bihar : _____ _____ _____
Havîn : _____ _____ _____
Payîz : _____ _____ _____
Zivistan : _____ _____ _____

3- Nêçîra peyv û komepeyvan

1. ***PAYÎZ***.....
2.....
3.....
4.....
5.....
6.....
7.....
8.....
9.....
10.....
11.....
12 .....

P	**A**	**Y**	**Î**	**Z**	W	Q	R	S	G
R	G	D	B	I	H	A	R	E	E
E	U	U	A	V	R	Ê	L	R	L
Ş	L	Ş	A	I	S	D	F	M	A
E	A	E	A	S	S	D	F	A	W
M	N	M	S	T	D	F	G	W	Ê
Î	S	Î	D	A	D	A	R	E	J
H	A	V	Î	N	X	Ş	E	M	Î

4- Cihên vala bi peyvên di nava qadê de dagirin.

dibistan	havîn	payîz	biharê	kulîlk	baran	germ	sar
berf	demsal	fêkî	pel				

Di salekê de çar _____ hene. Sala kurdî 21'ê adarê bi demsala _____ dest pê dike. Di biharê de _____ vedibin, dinya geş û xweş dibe. Piştî biharê _____ tê. Di havînê de dinya _____ dibe. Havînê _____ digihêjin. Li pey havînê_____ tê. Di payîzê de _____ diweşin. _____ dibare, _____ vedibin. Zivistan _____ e. _____ dibare.

B - Bikaranîna zimên

1-Lêkerên li jêr li gorî dema niha bikişînin.

1- Ez _____ (çûn) dibistanê.
2- Em ji malê _____ (hatin).
3- Dîlan ji mastî hez _____ (na/kirin).
4- Sosin derî _____ (vekirin).
5- Hogir her êvar zû _____ (raketin).
6- Zozan û Berfîn îro _____ (na/çûn) dibistanê.
7- Hûn li malê taştê _____ (na/xwarin).
8- Zozan destên xwe _____ (şûştin).
9- Tu tiştekî _____ (na/xwestin).
10- Gulşîn şîr _____ (na/vexwarin).
11- Ez rojnameyê _____ (na/xwendin).
12- Hûn îro _____ (na/xebitîn)?
13- Diya min her roj _____ (gerîn).
14- Ez her sibe _____ (meşîn).
15- Ez tu carî nameyan _____ (na/nivîsîn).
16- Birayên min li kuçeyê _____ (lîstin).
17- Baran _____ (na/barîn).
18- Serê min _____ (êşîn).
19- Ez benîşt _____ (cûtin).
20- Em li nûçeyan temaşe _____ (kirin).

2- Bi bêjeyên li jêr hevokan çêkin.

1- tu car / taştê / ez / naxwim _____
2- dijî / Hêlîn / Kerboranê/ li _____
3- dixwazin / em / azadiyê / _____
4- li / televîzyonê /tu / temaşe dikî / ? _____
5- ji / avjeniyê / ew / hez dike _____
6- carinan / em / geştê / diçin _____
7- bi şev / Jiyan / dereng / radikeve _____

3- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî dema niha bikişînin.

Mînak: Jêhat diçe dibistanê. (çûn)

Gulan her roj sibehê zû ji xewê _____. (hişyar bûn)
Ser çavên xwe _____. (şûştin)
Taştêya xwe _____. (xwarin)
Piştre, ew bi serwîsê _____ dibistanê. (çûn)
Waneyên wê saet di duyan de _____. (qedîn)
Gulan ji dibistanê derdikeve, _____ malê. (hatin)
Heta berêvarê ew bi hevalên xwe re _____. (lîstin)
Piştî şîvê spartekên xwe _____. (çêkirin)
Paşê jî _____. (raketin)

4- Ji hevokên jêrîn ji bo yên rast stûna (r) ji bo yên çewt stûna (ç) xêz bikin.

	Hevok	r	ç
1	Gulan serê sibehê zû radibe.	✓	
2	Gulan serê sibehê ser çavên xwe naşo.		
3	Gulan li malê taştê dixwe.		
4	Gulan bi peyatî diçe dibistanê.		
5	Gulan ber bi êvarê vedigere malê.		
6	Gulan berî şîvê spartekên xwe çêdike.		

5-Van pirsan li gorî xwe bibersivînin.

Mînak

Tu li Dirbêsiyê dijî?

Erê, ez li Dirbêsiyê dijîm.

Na, ez li Dirbêsiyê najîm.

1- Tu ji şanoyê hez dikî?

_____

2- Bavê te mamostetiyê dike?

_____

3- Tu li televîzyonê temaşe dikî?

_____

4- Bavê te her roj taştê dixwe?

_____

5- Dê û bavê te li Şamê dimînin?

_____

6- Tu û hevalên xwe, (hûn) diçin sînemayê?

_____

6- Saetên ku bi hejmaran hatine nivîsîn bi nivîsê binivîsin.

Mînak

4:03	Ji çaran sê dibore.
4:15	Çar û çaryek e.
4:30	Çar û nîv e.
3:40	Ji çaran re bîst heye.
3:45	Çar kêm çaryek.

3:08 _____

2:10 _____

8:15 _____

6:22 _____

7:25 _____

10:30 _____

2:34 _____

3:50 _____

1:45 _____

12:53 _____

11:19 _____

9:59 _____

7- Cihên vala bi qertafên tewangê dagirin.

1- Ên binavkirî

/-ê/, /-î/, /-an/

1- Ew deriyê mal___ vedike. (yekjimar)

2- Em dar___ av didin. (pirjimar)

3- Ez gul___ diçinim. (pirjimar)

4- Ew heval___ dibîne. (pirjimar)

5- Pelên dar___ diweşin. (yekjimar)

6- Tu çay___ vedixwî.

7- Ez bi Botan___ re diçim.

8- Ew diçe bajar___.

2- Ên nebinavkirî

/-ekê/, /-ekî/, /-inan/

1- Ez bi xort___ re dipeyivim. (yekjimar)

2- Em li xanî___ digerin. (yekjimar)

3- Ew name___ dinivîse. (yekjimar)

4- Dîlan li stran___ guhdariyê dike. (yekjimar)

5- Ew dar___diçîne. (pirjimar)

6- Em sêv___ dixwin. (pirjimar)

- Muzîk
- Werzîş
- Şano
- Sînema
- Xwendin
- Spartek

A- Muzîk

1- Li ser pirsên li jêr bipeyivin.

1- Hûn ji kîjan cureyê muzîkê hez dikin?
2- Dengê kîjan amûrên muzîkê bi we xweş tê?
3- Kêfa we ji kîjan hunermendî re tê?

2- Van peyvan binasin

stran amûr deng dengê zîz dengê dilsoj
zêmar dengbêj stranbêj dûrik huner
stirîn hunermend

3- Cihên vala bi peyvên li jor dagirin.

Dûrik, stranbêj, dilsoj, dengbêj, amûr, stran

1- Bilûr _____ muzîkê ye.
2- Meyremxan _____navdar a kurd e.
3- _____ Lawikê Metînî pir xweş e.
4- Karapêtê Xaço _____ e.
5- Zêmar stranên _____ in.
6- Navê stranên dawetan _____ e.

Stranek

Zimanê Kurdî

Bi xeml û rewş e
Şîrîn û xweş e
Şîrîn û xweş e
Zimanê kurdî

Beyta Feqî ye
Kubra Xanî ye
Kubra Xanî ye
Zimanê kurdî

Qewqeba çiyan e
Kubra Teyran e
Kubra Teyran e
Zimanê kurdî

Bi xweş awaz e
Letîf û naz e
Letîf û naz e
Zimanê kurdî

Bi xeml û rewş e
Şîrîn û xweş e
Şîrîn û xweş e
Zimanê kurdî

Stranbêj
Aramê Dîkran

Tu ji muzîkê hez dikî?

Azad	Tu ji muzîkê hez dikî?
Diyar	Erê, ez gelekî ji muzîkê hez dikim.
Azad	Kêfa te ji kîjan cureyê muzîkê re tê?
Diyar	Ez ji stranên dengbêjiyê pir hez dikim. Lê tu?
Azad	Ez ji stranên govendê hez dikim.
Diyar	Ez jî ji stranên govendê hez dikim.
Azad	Tu ji kîjan hunermendî hez dikî?
Diyar	Herî zêde ez ji Karapetê Xaço hez dikim. Tu ji kê hez dikî?
Azad	Ez ji dengê Miradê Kinê pir hez dikim.
Diyar	Kîjan kilam zêde li xweşa te diçin?
Azad	Kilama “Çemê Çetelê” û “Lawikê Metînî”.

4- Pirsên li jêr li gorî diyalogê bibersivînin.

1. Diyar ji kîjan cureyê muzîkê hez dike?

   _____

2. Kêfa Azad ji kîjan muzîkê re tê?

   _____

3. Diyar herî zêde ji kîjan hunermendî hez dike?

   _____

4. Kî ji dengê Miradê Kinê hez dike?

   _____

5. Kî ji kilama “Lawikê Metînî” hez dike?

   _____

Hin lêkerên biwêjî

Ez **ji** dûrikan **hez dikim.**
Kêfa min **ji** stranên Ciwan Haco **re tê.**
Dengbêjî **bala** min **dikişîne.**
Dengê bilûrê **bi** min **xweş tê.**

B- Werzîş

1- Pirsên li jêr nîqaş bikin.

1) Hûn ji kîjan cureyên werzîşê hez dikin?
2) Kêfa we ji futbolê re tê?
3) Hûn ji kîjan lîstikvanên futbolê hez dikin?
4) Hûn qet diçin kaşûnê?


gulaş

voleybol (goga destan)


futbol (goga pêyan)

kaşûn

jûdo

hespbezî


basketbol (goga zembîlê)

Tu ji werzîşê hez dikî?

Azad Ez ji werzîşê pir hez dikim.

Diyar Ez jî ji werzîşê pir hez dikim, nemaze ji avjeniyê.

Azad Ez jî ji goga piyan pir hez dikim.

Diyar Her wiha ez her roj serê sibehê saetekê jî li parkê dimeşim.

Azad Meş ji bo tenduristiya mirov pir baş e. Ez her hefte bi hevalên xwe re goga piyan dilîzim.

Diyar Hûn kîjan rojê dilîzin?

Azad Roja çarşemê.

Diyar Ez jî têm.

Azad Kerem bike.

Diyar Baş e, em ê hev bibînin.

2- Pirsên li jêr li gorî diyaloga li rex bibersivînin.

1. Kî ji avjeniyê hez dike?

_____

2. Azad ji çi hez dike?

_____

3. Diyar li ku dimeşe?

_____

4. Meş ji bo çi baş e?

_____

5. Azad tevî hevalên xwe kîjan rojê goga piyan dilîze?

_____

C- Şano û sînema

1- Pirsên li jêr bibersivînin.

***1-** Tu qet diçî sînemayê? **2-** Kêfa te ji kîjan derhênerî re tê? **3-** Şano bala te dikişîne?*

Hêlîn Ez van rojan hînî avjeniyê dibim. Kêfa min gelekî ji avjeniyê re tê.

Dîlan Ez jî gelekî ji avjeniyê hez dikim, lewma jî ez rojên duşemê diçim avjeniyê.

Hêlîn Bi rastî? Ez jî rojên yekşemê diçim avjeniyê. Rojên duşemê jî basketbolê dilîzim.

Dîlan Ez jî basketbolê dilizîm lê belê ez ne pir jêhatî me.

Hêlîn Tu beşdarî xebatên şanoyê jî dibî, ne wisa?

Dîlan Belê, em niha li ser lîstikekê dixebitin. Şano bala te dikişîne?

Hêlîn Na, kêfa min zêde ji şanoyê re nayê, ji ber vê yekê ez zêde naçim şanoyê. Lê belê, sînema gelekî bala min dikişîne. Kêfa min ji filmên Behman Qubadî re tê, her wiha ez ji fîlmên Kazim Oz jî hez dikim.

Dîlan Rast e. Behman Qubadî gelekî serkeftî ye. Ez jî gelekî ji sînemayê hez dikim. Lê, ji ber ku dema min zêde tune ye, ez her tim naçim sînemayê.

Hêlîn Belê tu rast dibêjî, tu beşdarî gelek çalakiyan dibî.

2- Ji hevokên jêrîn ji bo yên rast stûna (r) ji bo yên çewt stûna (ç) xêz bikin.

	Hevok	r	ç
1	Hêlîn qet ji avjeniyê hez nake.		
2	Dîlan di basketbolê de pir jêhatî ye.		
3	Şano bala Hêlînê nakişîne.		
4	Dîlan beşdarî xebatên şanoyê dibe.		
5	Hêlîn ji sînemayê hez nake.		
6	Dîlan her tim naçe sînemayê.		

Gihanek

Ji ber ku
Ji ber ku karê min zede ye, ez zêde naçim sînemayê.

Lewma
Ez ji meşê gelekî hez dikim, lewma ez her sibe dimeşim.

Lê belê
Ez ji sînemayê pir hez dikim, lê belê şano bala min nakişîne.

Her wiha
Ez ji çîrokan pir hez dikim her wiha helbest jî bala min dikişînin.

Ji ber vê yekê
Futbol qet bala min nakişîne, ji ber vê yekê ez qet naçim maçan.

Ji xeynî / ji bilî
Ji xeynî meşê ez qet werzîşê nakim.

D- Xwendin

1- Pirsên li jêr bibersivînin.

1- *Tu qet pirtûkan dixwînî?*
2- *Kefa te ji kîjan nivîskaran re tê?*
3- *Tu ji çîrokan hez dikî?*
4- *Helbest bala te dikişînin?*

Diyar Rojda tu qet pirtûkan dixwînî?
Rojda Erê, ez ji xwendinê pir hez dikim. Ez van rojan jî pirtûkeke Mehmet Uzun dixwînim.
Diyar Kîjan pirtûka wî?
Rojda "Siya Evînê". Pirtûkeke gelekî xweş e.
Diyar Rast e, pirtûkên Mehmet Uzun gelekî serkeftî ne. Ez jî van rojan pirtûka Hesenê Metê, "Labîrenta Cinan" dixwînim. Li gorî min Hesenê Metê jî nivîskarekî jêhatî ye.
Rojda Mixabin, ez wî nas nakim. Helbest jî bala te dikişînin?
Diyar Belê, nemaze helbestên Cîgerxwîn bi min gelekî xweş tên. Cîgerxwîn helbestvanekî bêhempa ye.
Rojda Ez jî wisa difikirim. Helbestên wî pir xweş in.

2- Li gorî bersivên li jêr pirsan binivîsin.

1- _____?
Rojda van rojan pirtûka Mehmet Uzun dixwîne.
2- _____?
Navê pirtûka Hesenê metê "Labîrenta Cinan" e.
3- _____?
Diyar ji Cîgerxwîn hez dike.



Heval, ez bilûrvan im
Dengê saza hozan im
Ji we ez dilgiran im
Ez nizanim çi bêjim.

Bi rastî?	**Ne wisa?**	Belê, ...	**Belê, tu rast dibêjî.**	Rast e.
Mixabin,	Li gorî min …	**Ez wisa nafikirim.**	Ez jî wisa difikirim.	

A - Xebata li ser peyvan

1- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.

şano	werzîş	avjenî	hunermend			
stran	***govend***	tenduristî	lîstik			

Mînak Ez ji ***govendê*** hez dikim.

Dîlan Tu ji kîjan _____ hez dikî?
Bengî Ez ji Mihemed Şêxo hez dikim.
Dîlan Tu ji kîjan _____ wî hez dikî?
Bengî Ez ji strana “Ay lê Gulê” hez dikim.

Serhat Tu ji _____ hez dikî?
Tevger Belê, bi taybetî ez ji goga piyan hez dikim.
Serhat Tu ji _____ hez dikî?
Tevger Na, ez ji avê ditirsim.
Serhat Lê avjenî ji bo _____ pir baş e.

Zelal Tu qet diçî _____?
Aram Belê, ez îro diçim Şanoya Hêvî.
Zelal Navê lîstikê çi ye?
Aram “Derwêşê Evdî” ye.

2- Nêçîra peyvan

1. ***HELBEST***
2. .....
3. .....
4. .....
5. .....
6. .....
7. .....
8. .....

E	D	R	**H**	**E**	**L**	**B**	**E**	**S**	**T**	E
H	E	G	E	T	H	I	L	H	A	M
E	N	E	T	I	A	V	J	E	N	Î
N	G	Ş	L	V	V	G	H	L	T	Û
G	B	T	T	A	Î	E	R	T	Y	R
E	Ê	G	N	Z	N	Q	W	X	R	K
Q	J	H	E	E	E	R	Ş	A	N	O
A	R	J	G	Y	G	G	T	T	T	L
P	A	Ş	K	A	Z	A	M	Î	M	Ê
D	T	J	R	M	T	Y	Q	W	E	S
W	E	R	Z	Î	Ş	B	I	L	Û	R

B- Xwendin û bikaranîna zimên

Navê min Evîn e. Ez li Kobanê dijîm. Ez rojnamevan im, lewma ez li gelek bajaran digerim. Ez ji dîtina cihên nû gelekî hez dikim. Ez nivîsên xwe bi êvaran dinivîsim.
Ez nûçeyên der barê çand û hunerê de dinivîsim. Ji ber vê yekê ez beşdarî gelek mîhrîcanên çandî û hunerî dibim. Kêfa min gelekî ji şanoyê re tê. Ez li hemû lîstikên bi kurdî temaşe dikim. Li gorî min Şehîd Yekta şanogerekî serkeftî ye.
Wêje jî gelekî bala min dikişîne, bi taybetî helbest. Ez ji helbestên Cigerxwîn pir hez dikim. Ez jî helbestan dinivîsim, lê belê ez wan naweşînim.
Ji xeynî meşê ez qet ji werzişê hez nakim. Ez carinan li ber çem dimeşim. Kêfa min gelekî ji meşê re tê.

1- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.

1- Evîn çima li gelek bajaran digere? _____
2- Ew nivîsên xwe kengî dinivîse? _____
3- Ew der barê çi de dinivîse? _____
4- Ew ji helbestên kê hez dike? _____
5- Ew li ku derê dimeşe? _____

Navê min Dildar e. Ez li Amûdê dijîm. Ez parêzer im. Ez ji karê xwe hez dikim. Ez sibe zû radibim û rojnameyan dixwînim.

Ez ji werzîşê gelekî hez dikim, nemaze ji futbolê. Ez rojên şemiyê bi hevalên xwe re futbolê dilîzim. Rojên yekşemê jî ez diçim sînemayê, kêfa min gelekî ji sînemayê re tê. Ez qet ji şanoyê hez nakim. Ez tu carî naçim şanoyê. Lê belê, wêje gelekî bala min dikişîne, nemaze çîrokên gelêrî. Ez jî çîrokan dinivîsim û wan di hin kovaran de diweşînim.

2- Li gorî her du nivîsên li jor cihên vala dagirin.

1- Evîn li _____ dijî, lê belê Dildar li _____ dijî.
2- Evîn ji _____ hez dike, lê belê Dildar qet ji _____ hez nake.
3- Dildar ji _____ hez dike, lê belê Evîn qet ji _____ hez nake.
4- Her du jî ji _____ hez dikin.

3- Di nivîsa li jêr de lêkeran li gorî dema niha bikişînin.

Ji xeynî xebatê tu dema xwe çawa derbas dikî?

Ez ji avjeniyê pir hez _____ (kirin). Ez rojên şemiyê _____ (çûn) avjeniyê. Kêfa min gelekî ji gerê re _____ (hatin). Ez rojên yekşemê bi hevalên xwe re _____ (gerîn). Carinan jî em _____ (çûn) sînemayê.

Tu qet li televîzyonê temaşe _____ (kirin)?

Na, ez pirtûkan _____ (xwendin). Helbest gelekî bala min _____ (kişandin). Ez bi xwe jî helbestan _____ (nivîsîn). Ez carinan helbestên xwe di kovaran de _____ (weşandin).

Lê muzîk?

Muzîk! Muzîk jiyana min e. Ez stranan _____ (gotin) û li gîtarê _____ (dan).

4- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.

Rast e. ***Ne wisa?*** ***Tu rast dibêjî.*** ***Li gorî min***

Bager Zîlan, kêfa te ji wêjeyê re tê, _____

Zîlan _____ Wêje gelekî bala min dikişîne, nemaze helbest. _____, Cîgerxwîn helbestvanekî hêja ye.

Bager _____ Ez jî gelekî ji helbestên wî hez dikim. Ez îro diçim mîhrîcana helbestan. Tu jî têyî?

Zîlan Belê, ez jî têm.

5- Cihên vala bi gihanekên li jêr dagirin.

ji ber ku ***lewma*** ***lê belê*** ***ji ber vê yekê*** ***Ji xeynî***

1- Bavê min bi êvaran pir dereng tê malê, _____ em wî nabînin.

2- _____ diya min, em hemû ji govendê hez dikin.

3- _____ baran dibare, zarok dernakevin kuçeyê.

4- Ez ji basketbolê pir hez dikim, _____ ez qet ji futbolê hez nakim.

5- Zelal pir dixebite, _____ ew gelekî serkeftî ye.

6- Bersivên pirsên li jêr li gorî xwe bidin.

1- Tu qet li televîzyonê temaşe dikî?

_____

2- Tu li muzîkê guhdariyê dikî?

_____

3- Kêfa te ji kîjan stranbêjan re tê?

_____

4- Tu qet rojnameyan dixwînî?

_____

5- Tu kîjan rojnameyan dixwînî?

_____

6- Tu pirtûkan dixwînî?

_____

7- Kêfa te ji kîjan nivîskaran re tê?

_____

8- Kêfa te ji sînemayê re tê?

_____

9- Tu qet diçî şanoyê?

_____

10- Tu ji kîjan lîstikvanan hez dikî?

_____

11- Tu qet diçî geştê?

_____

12- Kêfa te ji gerê re tê?

_____

13- Tu ji şanoyê hez dikî?

_____

14- Tu ji avjeniyê hez dikî?

_____

15- Kêfa te ji helbestan re tê?

_____

16- Kêfa te ji dengbêjan re tê?

_____

17- Tu helbestan dinivîsî?

_____

18- Tu ji kîjan helbestvanan hez dikî?

_____

19- Dîrok bala te dikişîne?

_____

Nivîs

Tu dema xwe çawa derbas dikî?

Li gorî bersivên xwe nivîsekê der heqê xwe de binivîsin

- li malê
- li sûkê
- kiriyarî
- spartek

A- Li malê

Dîlan Ez dixwazim hêkekê bixwim.
Pelîn Ez şîr venaxwim. Ez dixwazim îskanek çay vexwim.
Dilşa Şîr vexwe, zû mezin bibe.
Serhat Ez ji mastî hez dikim. Dayê mast tune ye?
Dilşa Heye kurê min.
Serhat Nanê qelandî bi mast re pir xweş e.
Dîlan Bi dimsê jî xweş e. Ez jê pir hez dikim.
Serhat Lê hingiv? Ew wekî derman e.
Dîlan To jî pir xweş e.
Serhat Hêkerûn û qelî jî pir xweş in.

1- Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.

1. Dîlan dixwaze çi bixwe?

_____

2. Kî şîr venaxwe ?

_____

3. Kî ji mastî hez dike ?

_____

4. Dîlan ji çi pir hez dike ?

_____

5. Li gorî kê hêkerûn û qelî pir xweş in?

_____

Raweya Fermanî

Lêker	Pêşgir	Qertafa fermanê	Rayeka dema niha	Qertafên kesane	Forma fermanî	Forma neyînî
çûn			ç		biçe/biçin (here/herin)	meçe/meçin (mere/merin)
gotin			bêj		bibêje/bibêjin	mebêje/mebêjin
girtin		bi	gir	e (yekjimar)	bigire/bigirin	megire/megirin
kirîn			kir	in (pirjimar)	bikire/bikirin	mekire/mekirin
domandin			domîn		bidomîne/bidomînin	medomîne/medomînin
rakirin	ra	-	k		rake/rakin	rameke/ramekin
dagirtin	da		gir		dagire/dagirin	damegire/damegirin

Forma neyînîyê ya raweya fermanî bi “ne-” yê jî pêk tê. Mînak : meçe-neçe/meçin-neçin

Daxwazên Dilşayê ji Dîlanê

Keça min. Ez niha diçim kar.
Tu jî nivînên xwe berhev bike.
Malê hinekî bide hev.Serhat hişyar bike.
Hinek firaqên neşûştî hene, wan bişon.
Kincên şûştî ji cilşoyê derxin û raxin
Odeya Serhat zêde belawela ye, destên xwe mede wir, bila ew bi xwe bide hev.

Biçe dikanê

Dilşa Kurê min ka were vir!
Serhat Kerem bike dayê.
Dilşa Mêvan tên, biçe dikanê û hinek tiştan bîne.
Serhat Bibêje dayê, ez çi bînim?
Dilşa Sê nan, du kîlo birinc, kîloyek goştê kutandî û kasikek mast bikire.
Serhat Belê dayê, tiştekî din heye?
Dilşa Na, tu van ji bîr meke bes e.
Serhat Baş e.
Dilşa Here û zû were.

Lêkera alîkar “xwestin”

cînavkên kesane	lêkera alîkar	raweya merc û daxwaziyê
Ez	dixwazim / naxwazim	biçim.
Tu	dixwazî / naxwazî	biçî.
Ew	dixwaze / naxwaze	biçe.
Em	dixwazin / naxwazin	biçin.
Hûn	dixwazin / naxwazin	biçin.
Ew	dixwazin / naxwazin	biçin.

Ez	dixwazim	tu	biçî.
		ew	biçe.
		em	biçin.
		hûn	biçin.
		ew	biçin.

Hîndarî

1- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî raweya fermanî bikişînin.

1- Sibe zû _____ (rabûn) û _____ (xebitîn).
2- Hundir sar e, paceyê _____ (girtin).
3- Serê min diêşe, êşbirekê _____ (dayîn) min.
4- Ji ser darê _____ (daketin / pirjimar)!
5- Xwişka te radikeve, dengê xwe bilind _____ (kirin / me).
6- Tu her tim digirî, hinekî _____ (kenîn).
7- Karê min gelek e, alîkariya min _____ (kirin / pirjimar).
8- Ew der zêde ne ewledar e, bi tenê _____ (çûn / me).
9- Delal, dengê te gelekî xweş e. Ji me re stranekê _____ (gotin)
10- Destên te qîrêjî ne, _____ (çûn), _____ (şûştin)

2- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî forma rast bikişînin.

1- Ez dixwazim tu min _____ (parastin).
2- Ez dixwazim _____ (meşîn)
3- Ez naxwazim berf _____ (barîn).
4- Em naxwazin betlane _____ (qedîn).
5- Ez naxwazim zarok li kuçeyan _____ (jiyîn).
6- Em dixwazin tu _____ (vegerîn).
7- Tu dixwazî _____ (lîstin)?
8- Ez dixwazim tu rastiyê _____ (gotin).
9- Ew naxwaze li min guhdariyê _____ (kirin).
10- Bavê min dixwaze ez pir _____ (xebitîn).

3- Bi bêjeyên li jêr hevokan çêkin.

1- Ez / xwestin/ tu / çîrokan / gotin
_____
2- Tu / xwestin / gerîn /?
_____
3- Zozan / xwestin / bi me re / hatin
_____
4- Em / xwestin / kurdî / hîn bûn
_____
5- Hûn / xwestin / çûn / ber deryayê / ?
_____

B- Li sûkê

1- Navên sebze û fêkiyan binivîsin.

fêkî alû **tû** xox **tiriyê zer** vîşne **hirmî** şemamok **hêjîr** tiriyê reş **mandalîna** hinar **porteqal** sêv **zebeş** îsot

sebze **tûzik** bexdenûs **kartol** lîmon **pîvaz** mişmiş **fasûlî** firingî **gilgil** kelem **gizêr** balîcan **sîr** kundir **xiyar**

Rodî fêkiyan dikire

Sertac Sêv baş xuya dikin.
Rodî Ez dixwazim sê kîloyan bikirim.
Sertac Baş e, bikire! Ez jî du kîloyan dikirim.
Rodî Tiriyê reş çawan e?
Sertac Ew jî ne xirab e.
Rodî Ez du kîlo jî tiriyê reş dikirim.
Sertac Baş e, ez jî dixwazim kîloyek hinar bikirim.
Rodî Kîloyek firingî, baqek bexdenûs jî pêwîst in.
Sertac Pêwîstiya min bi baqek pîvazên ter heye.
Rodî Divê ez kartol, tivir, gizêr û sîrik jî bikirim.
Sertac Çima tu ev qas zêde sebze û fêkiyan dikirî?
Rodî Mêvanên me hene.

1- Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.

1. Kî dixwaze sê kîlo sêv bikire?

_____

2. Rodî çend kîlo tiriyê reş dikire?

_____

3. Kî kîloyek hinar dikire?

_____

4. Pêwistiya Sertac bi çi heye ?

_____

5. Rodî ji bo çi ev qas zêde sebze û fêkiyan dikire?

_____

C- Kiriyarî

Rodî Kîloya qidaman bi çi ye?
Firoşkar Bi du panotan e.
Rodî Ka ji kerema xwe du kîloyan bide.
Firoşkar Tu tiştekî din dixwazî?
Rodî Ez kîloyek jî dendikên gulan dixwazim.
Firoşkar Wekî din daxwazeke te heye?
Rodî Belê, lîtreyek jî ava fêkiyan. Hemû dike çiqas?
Firoşkar Bi tevahî dike 8 panot û nîv.
Rodî Kerem bike.
Firoşkar Keremdar be.

1- Beşên hevokan bigihînin hev û hevokan temam bikin.

1. Rodî ji firoşkar
2. Kîloya qidaman
3. Tiştên ku Rodî dikire
4. Rodî kîloyek
5. Rodî lîtreyek

a. bi tevahî dike heşt panot û nîv.
b. buhayê qidaman dipirse.
c. ava fêkiyan dixwaze.
d. bi du panotan e.
e. dendikên gulan dikire.

1	2	3	4	5
b				

Têgeh û peyvên kiriyariyê

Pirs

Kîloya mûzan bi çi ye?
Nîv kîlo bindeq dike çiqas?
Ev bi çend panotan e ?
Libek kelem bi çiqasî ye?
250 gram kakilên gûzan çiqas digire?

Bersiv

Kîloya mûzan bi sê panot û nîvan e.
Nîv kilo bindeq dike neh panot.
Ev bi pazdeh panotan e.
Libek kelem bi çar panotan e.
250 gram kakilên gûzan pênc panot digire.

D- Têkberên elektronîk

1- Navdêrên di nava qadê de di bin wêneyan de binivîsin.

cilşo	firin	firaqşo	sarinc	televîzyon	şofben	kompîtur	tozmij

1) _____

2) _____

3) _____

4) _____

5) _____

6) _____

7) _____

8) _____

Kirîna têkberan

Kawa Em îro biçin têkberên nava malê bikirin.
Şermîn Baş e, jixwe zêde dema me nema.
Kawa Ka em lîsteyekê amade bikin.
Şermîn Rast e, bêyî lîste nabe.
Kawa Tu bibêje, ez binivîsim.
Şermîn Çilşo, sarinc, firin, tozmij, televîzyon…
Kawa Wekî din, gelo em firaqşoyekê jî nekirin?
Şermîn Niha ne pêwîst e.
Kawa Baş e, her wiha em kompîturekê jî bikirin.
Şermîn Bila be. Gelo li malê xeta telefonê heye?
Kawa Erê, lê em înternetê jî girê bidin.
Şermîn Ew karê paşê ye.
Kawa Ev qas bes e. Nexwe em herin.
Şermîn Em biçin, dibe ku li firoşgehê jî hin tişt bên bîra me.

2- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.

1. Şermîn dixwaze kîjan têkberan bikire?

_____

2. Ew firaqşoyekê jî dikirin an na?

_____

3. Ew înternetê jî girê didin?

_____

4. Kawa û Şermîn diçin ku derê?

_____

Pêşniyar (kesên yekem)

cînavkên kesane	lêker
Ez	biçim / bikim / bixwim / bibînim / bimeşim
Em	biçin / bikin / bixwin / bibînin / bimeşin

Em biçin parkê?

Azad Dîlan, îro betlane ye. Em çi bikin?
Dîlan Ez dixwazim bigerim. Em biçin seyrangehê, bigerin?
Azad Belê, ez jî dixwazim li bin daran rûnim.
Dîlan Em gazî hevalan bikin. Bila ew jî werin.
Azad Tu rast dibêjî. Ez li Diyarî bigerim. Bila ew gogê bîne. Em li wir bi gogê bilîzin.
Dîlan Belê, ez jî li Hêlînê bigerim. Bila ew jî wênegira xwe bîne.
Azad De baş e. Ka em li wan bigerin.
Dîlan Bila be.

3- Lêkerên di nav kevanekê de li gorî forma rast bikişînin.

Dîlan Hêlîn, merheba! Tu çi dikî?
Hêlîn Rojbaş Dîlan. Ez li malê me. Ez roj-nameyê dixwînim. Tu çi dikî?
Dîlan Ez bi Azadî re me. Em dixwazin _____ (çûn) parkê. Tu jî nayêyî?
Hêlîn Belê, ez jî dixwazim _____ (hatin) Ez gazî Rojdayê jî _____ (kirin)?
Dîlan Erê. Bila ew jî _____ (hatin) Bila werîsekî jî _____ (anîn). Em hêlekanê _____ (çêkirin)
Hêlîn Temam. Em li ber parkê hev _____ (dîtin)?
Dîlan Erê. Heta saetekê em li wir in. Ha, wêne-gira xwe jî _____ (anîn)!
Hêlîn Bila be.
Dîlan De baş e. Vê gavê bi xatirê te.

Raweya Bilanî (kesên sêyem)

bilanî	kesê sêyem	forma fermanî
Bila	ew	biçe/biçin
		bixwaze/bixwazin
		bigire/bigirin
		bibe/bibin

Çûna şanoyê

Avesta Heta êvarê çar saet dema me heye. Em çi bikin?
Hêlîn Em biçin şanoyê?
Avesta Di şanoyê de kîjan lîstik dilîze?
Rojda Ez bawer dikim, lîstika “Mişko” dilîze.
Dîlan Bila yek ji me biçe bilêtan bikire.
Azad Ez biçim, kî tê şanoyê bila heqê bilêta xwe bide!
Hêlîn Ez diçim malê. Diya min li benda min e.
Dîlan Lîstik kengê dest pê dike?
Rojda Saet di pêncan de dest pê dike.
Azad Em saet di çaran de li ber deriyê şanoyê hev û du bibînin.

4- Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.

1. Îro çiqas dema wan heye?

_____

2. Di şanoyê de kîjan lîstik dilîze?

_____

3. Lîstîk kengê dest pê dike?

_____

4. Kî diçe bilêtan dikire?

_____

5. Ew saet di çendan de li ku derê hev dibînin?

_____

A - Xebata li ser peyvan

1- Navên tiştên di wêneyan de li bin wan binivîsin.

firingî | tirî | zebeş | alû | vîşne | tivir | kelem | mişmiş | gûz

1) _____

2) _____

3) _____

4) _____

5) _____

6) _____

7) _____

8) _____

9) _____

2- Li gorî wêneyan xaçepirsê dagirin.



3- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.

cilşo	sarinc	firaqşo	tozmij	firin

1- Ez kincên xwe bi _____ naşom.

2- Ez ê firaqên xwe bixim _____.

3- Ez malê bi _____ dimalim.

4- Ji bo ku sar bibe, em avê dixin _____.

5- Em carinan xwarinê di _____ de dipêjin

B- Bikaranîna zimên

1- Valahiyên diyaloga li jêr temam bikin û bixwînin.

zebeşekî	digire	kîlo	tirî	panot	çend

Rodî Ji kerema xwe _____ bide!
Fêkîfiroş Ev baş e?
Rodî Belê, baş e. _____ kîlo tê?
Fêkîfiroş Pênc _____ ye. Tirî jî dagirim?
Rodî Belê, du kîlo jî _____ bikişîne.
Fêkîfiroş Wekî din tiştekî dixwazî?
Rodî Na, spas! Hemû li ser hev çiqasî _____ ?
Fêkîfiroş Hemû dike 23 _____ û 75 quriş.
Rodî Kerem bike.
Fêkîfiroş Keremdar be.

2- Li gorî diyaloga li jor beşên hevokan bigihînin hev û hevokan temam bikin.

1. Rodî ji dikandar
2. Fêkîfiroş
3. Zebeşê ku Rodî dikire
4. Rodî

a. du kîlo tirî dadigire.
b. zebeşekî dixwaze.
c. 23 panot, 75 quriş dide dikandar.
d. pênc kîlo ye.

1	2	3	4
b			

3- Hevokên li jêr sererast bikin.

1- bi / zebeşek / ye / çiqasî / ?

_____

2- tiriyê /kîloya / reş/ çend / bi / e / panotan / ?

_____

3- dendikên / nîv / gulan / digire / çiqas / kîlo / ?

_____

4- çar / kelem / panotan / libek / bi / e /.

_____

5- bexdenûs / bîst û pênc / baqek / e / qurişan / bi /.

_____

6- îsotan / bi / kîloya / e/ çendan / ?

_____

4-Cihên vala li gorî forma rast dagirin.

Ronî Gelo, em îro çi _____ (kirin)?
Şîlan Ez dixwazim _____ (çûn) sînemayê. Tu çi difikirî?
Ronî Dibe. Em _____ (çûn) fîlmê 'Du ziman û yek bahol'? Dibêjin fîlmekî pir xweş e.
Şîlan Belê, belê. Ez jî dixwazim li wî fîlmî temaşe _____ (kirin).
Ronî Lê, ez niha birçî me. Em pêşî tiştekî _____ (xwarin).
Şîlan Ez jî birçî me. Em çi _____ (xwarin)?
Ronî Em biçin Xwaringeha Newal buryan bixwin!
Şîlan Baş e. De ka em biçin.

5- Cihên vala li gorî raweya fermanî dagirin.

1- Ji kerema xwe du kilo sêv _____ (dan) min.
2- Helbestên Seydayê Tîrêj pir xweş in, _____ (xwendin)!
3- Odeya te pir qirêjî ye, paqij _____ (kirin)!
4- Sibe karê me pir e. Îşev zû _____ (raketin)!
5- Pereyê me kêm e. Zêde tiştan _____ (me / kirîn / pirjimar)!

6- Li gorî mînakan ji bo rewşên li jêr hevokan binivîsin.

Mînak *Rojda nexweş e.*
Bila biçe nexweşxaneyê

1- Delal westa ye.
_____
2- Sîdar birçî ye.
_____
3- Sibe ezmûna Baranî heye.
_____
4- Dildar pir qelew e.
_____
5- Zelal dixwaze hînî îngilîzî bibe.
_____

7- Hevokên li jêr li gorî daxwazên xwe biqedînin.

1- Ez dixwazim îşev
_____
2- Ez dixwazim di rojbûna xwe de
_____
3- Ez dixwazim diya min
_____
4- Ez dixwazim mirov
_____
5- Ez dixwazim mamosteyê/a min
_____

Nivîs

Hûn dixwazin vê havînê çi bikin?

Ez dixwazim vê havînê .....

- Cil û berg
- Ez dikarim ...
- Divê ez çi bikim?
- Spartek

A- Cil û berg

1- Navên cilan li bin wêneyan binivîsin.

fîstan	dêre	derpê	kurtek	şal	sol	şimik	sako	palto	lepik	gore	binkiras

1).....

2).....

3).....

4).....

5).....

10).....

6).....

7).....

8).....

9).....

11).....

12).....

Li firoşgeha cil û bergan

Evîn	Reyona cil û bergên jinan li qata çendan e?
Peywirdar	Kerem bikin qata herî jor e.
Zozan	Spas.
Evîn	Ez dixwazim ji xwe re fîstanekî gulgulî bikirim. Tu çi dixwazî?
Zozan	Ez jî dixwazim ji xwe re dêreyeke sor bikirim.
Evîn	Ev dêre çawan e, gelo bi dilê te ye?
Zozan	Erê, gelekî xweşik e. Ez li xwe bikim, ka li min dibe yan na?
Evîn	Baş e, ez jî çavên xwe li fîstanekî gulgulî bigerînim.
Zozan	Gelo ev çawa ye, li min tê?
Evîn	Erê, pir baş li te tê.
Zozan	Baş e, ez vê dêreyê dikirim. Tu çi dikî?
Evîn	Ez jî vî fîstanî diceribînim.
Zozan	Baş e, ez li hêviya te me.
Evîn	Ev piçekî fireh e, ez yekî biçûktir dixwazim.
Zozan	Bipirse ka yekî biçûktir heye.
Evîn	Belê, ez bipirsim bê ka yekî biçûktir nîn e.

2- Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.

1. Reyona cil û bergên jinan li qata çendan e?

_____

2. Evîn fîstanekî çawa dixwaze?

_____

3. Zozan dixwaze çi bikire?

_____

4. Dêre li bejna Zozanê tê?

_____

Payeya rengdêran

Rengdêr	Hevrûkirin	Payeya berztirîn
mezin	mezintir	mezintirîn / herî mezin
biçûk	biçûktir	biçûktirîn / herî biçûk
nizm	nizmtir	nizmtirîn / herî nizm

Evîn li fîstanekî biçûktir digere.

Evîn Gelo fîstanekî biçûktir heye?
Peywirdar Na, mixabin fistanê biçûktirîn ew e.
Evîn Kêfa min gelekî ji vî fîstanî re tê, lê hinekî fireh e.
Peywirdar Em yekî tengtir ji te re bînin.
Evîn Kengê tê?
Peywirdar Herî zêde di nava sê rojan de em tînin.
Evîn Ji sê rojan zûtir nayê?
Peywirdar Herî kêm di nava du rojan de em dikarin bînin.
Evîn Baş e. Ez piştî du rojên din têm.
Peywirdar Tu tiştekî din dixwazî?
Evîn Na, gelek spas. Bila dereng nemîne bes e.

Hîndarî

1- Cihên vala bi rengdêrên hevrûkirî dagirin.

biçûk	**nerm**	**kin**	**tirş**	**bilind**		
dirêj	**şîrîn**	**mezin**	**hişk**	**nizm**		

1) Kûsî ji kêrgoşkan **hêdîtir** in.
Kêrgoşk ji kûsiyan **lezgîntir** in.

2) Çiyayê Agirî ji Çiyayê Gebarê _____ e.
Çiyayê Gebarê ji Çiyayê Agirî _____ e.



3) Lîmon ji pirteqalan _____ in.
Pirteqal ji lîmonan _____ in.



4)Mişk ji fîlan _____ in.
Fîl ji mişkan _____ in.

5)Zurafa ji hirçan ..... in.
Hirç ji zurafayan ..... in.

6) Berû ji gûzan ..... in.
Gûz ji berûyan ..... in.

2- Cihên vala bi payeya hevrûkirinê ya rengdêran dagirin.

1- Havînan Efrîn ji Amûdê _____ e. (hênik)
2- Zozanên me ji bihuştê _____ in. (xweş)
3- Birayê min ji min _____ e. (dirêj)
4- Xwişka min ji birayê min _____ e. (zîrek)
5- Apê min ji xalê min _____ e. (xizan)
6- Hewaya gundan ji ya bajaran _____ e. (paqij)
7- Dîlan ji Rohîvê _____ e. (çalak)
8- Diya min ji periyan _____ e. (xweşik)

Kî dizane?

Asya	Vatîkan	Merkûr	Rûsya	Gronland	Everest

3- Cihên vala dagirin.

1- Bilindtirîn çiyayê cîhanê _____ e/ye.
2- Mezintirîn welatê cîhanê _____ e / ye.
3- Mezintirîn parzemîna cîhanê _____ e/ye.
4- Biçûktirîn gerestêrk _____ e/ye.
5- Li cîhanê cihê herî sar _____ e/ye.
6- Biçûktirîn welatê cîhanê _____ e/ye.

Silo (23)



Sebro (18)

4- Li gorî wêneyan hevokan biqedînin.

1- Sebro ji Silo _____ e.
2- Sebro ji Silo _____ e.
3- Sebro ji Silo _____ e.
4- Silo ji Sebro _____ e.
5- Silo ji Sebro _____ e.
6- Silo ji Sebro _____ e.

5- Cihên vala bi forma rast a rengdêran dagirin.

Rohîv Ev fîstan çawa ye?
Delal Li gorî min ev ji yê şîn _____ e. (xweşik)
Rohîv Bi gotina te ye. Lê ev ji yê şîn _____ e. (biha)
Delal Tu dizanî.

Hêvî Ev dêre piçekî biçûk e. Gelo dêreyeke _____ (mezin) heye?
Peywirdar Mixabin dêreyê _____ (mezin) ew e.

Zelal Li gorî min Behman Qubadî_____ (jîr) derhênerê kurd e.
Arda Ez wisa nafikirim. Xelîl DAX ji Behman Qubadî _____ e. (serkeftî)

Adar _____ (rengîn) bajarê kurdan Amed e.
Bahoz Belê tu rast dibêjî. Her wiha _____ (mezin) bajarê me jî Amed e.

Lorîn Ez dibêjim çînî ji îngilîzî _____ e. (dijwar)
Hêja Belê, çînî ……..(dijwar) zimanê cîhanê ye.

Kulîlk Tu çima bi otobusê diçî?
Zinar Ji ber ku otobus ji balafirê ……. e. (erzan)

Zerya Tu çima di vê riyê re diçî?
Sosin Ji ber ku ev ……. e. (kurt)

B- Ez dikarim _____

Rojda Dîlan, tu dikarî avjeniyê bikî?
Dîlan Belê, ez dikarim. Ez di avjeniyê de gelek jêhatî me.
Rojda Pir baş e. Mixabin ez nikarim baş avjeniyê bikim. Lê ez dikarim basketbolê bilîzim.
Dîlan Belê, ez jî ji basketbolê hez dikim, lê ez pir ne jêhatî me. Ez di muzîkê de gelek pêşketî me. Ez dikarim gîtar û bilûrê lê bidim.
Rojda Ez jî ji muzîkê hez dikim. Lê ez nikarim amûreke muzîkê lê bidim. Ez tenê dikarim stranan bibêjim.
Dîlan Ez dikarim te hînî lêdana bilûrê bikim.
Rojda Ez ê gelekî kêfxweş bibim.

1- Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.

1. Kî dikare avjeniyê bike ?
   .....
2. Rojda dikare çi bilîze?
   .....
3. Dîlan dikare kîjan amûrên muzîkê lê bide?
   .....
4. Kî dikare stranan bibêje?
   .....
5. Dîlan dixwaze Rojdayê hînî çi bike?
   .....

2- Ji karên li jêr ên ku hûn dikarin û yên ku hûn nikarin diyar bikin.

Mînak: Ez dikarim / nikarim bi kurdî biaxivim.

1. Ez dikarim / nikarim li bilûrê bidim.
2. Ez dikarim / nikarim kompîturê bi kar bînim.
3. Ez dikarim / nikarim bi îngilîzî bipeyivim.
4. Ez dikarim / nikarim wêneyan xêz bikim.
5. Ez dikarim / nikarim govendê bigirim.
6. Ez dikarim / nikarim stranan bibêjim.
7. Ez dikarim / nikarim helbestan binivîsim.
8. Ez dikarim / nikarim avjeniyê bikim.

3- Lêkera karînê li gorî cînavkan bikişînin.

Mînak Ez *dikarim* bi kurdî biaxivim.

1. Tu _____ li gîtarê bidî?
2. Hûn _____ kompîturê bi kar bînin. (neyînî)
3. Ew _____ bi tirkî bipeyivin.
4. Em _____ stranan bibêjin.
5. Ez _____ helbestan binivîsim. (neyînî)

4- Lêkera bingehîn li gorî cînavkan bikişînin.

Mînak: Ew dikare bi kurdî *binivîse*.

1. Ew dikare govendê _____ (girtin)?
2. Em nikarin wêneyan xêz _____ (kirin).
3. Tu dikarî xwarinê _____ (çêkirin)?
4. Hûn dikarin erebeyê _____ (ajotin).
5. Ez nikarim gulan _____ (çandin).

Karîn

Cînavkên kesane	Lêkera alîkar	Raweya merc û daxwaziyê
Ez	dikarim/nikarim	bibezim.
Tu	dikarî /nikarî	bibezî.
Ew	dikare/nikare	bibeze.
Em	dikarin/nikarin	bibezin.
Hûn	dikarin/nikarin	bibezin.
Ew	dikarin/nikarin	bibezin.

C- Divê ez çi bikim?

Dîlan Hêlîn tu çima xemgîn î? Tu çi difikirî?
Hêlîn Sibe ezmûna îngilîzî heye. Ez li wê difikirim. Ez nikarim îngilîzî hîn bibim.
Dîlan Ez dikarim alîkariya te bikim. Lê divê tu jî bixebitî.
Hêlîn Baş e. Divê ez çi bikim?
Dîlan Divê tu peyvên nû li lênûska xwe binivîsî û ji ber bikî. Dive tu çîrokên kurt bixwînî.
Divê tu li stranên bi ingilîzî guhdariyê bikî. Divê tu di fêrgehê de bi îngilîzî bipeyivî.
Hêlîn Tu rast dibêjî. Lê dîsa jî zehmet e.

1- Lorîn dixwaze kurdiya xwe bi pêş bixe, divê çi bike?

1- Divê li stranên bi kurdî guhdariyê _____ (kirin).
2- Divê rojname û kovarên bi kurdî _____(xwendin).
3- Divê li televîzyonên bi kurdî temaşe _____(kirin).
4- Divê bi kurdan re bi kurdî _____ (peyivîn).
5- Divê peyvên nû li lênûska xwe _____ (nivisîn) û ji ber _____ (kirin).

Sertac Ferzende tu qet werzîşê dikî?
Ferzende Na, mixabin. Lê divê ez werzîşê bikim, ez van rojan qelew dibim.
Sertac Ji bo ku tu qelew nebî, divê tu her sibe bimeşî yan jî hefteyê du sê rojan biçî avjeniyê.
Ferzende Belê tu rast dibêjî, avjenî û meş ji bo tenduristiyê pir baş in.
Sertac Divê tu xwarinên kêmrûn bixwî û sebze û fêkiyan bixwî.
Ferzende Bi gotina te ye. Ez pir kêm sebze dixwim. Ez bi piranî goştê sorkirî dixwim.
Sertac Her wiha divê tu avê pir vexwî. Av jî ji bo tenduristiyê baş e.

Nivîs

Ji bo tenduristiyê divê mirov çi bike?

_____
_____
_____
_____
_____

Divêtî

Divê	ez bixebitim.
	tu bixebitî.
	ew bixebite.
	em bixebitin.
	hûn bixebitin.
	ew bixebitin.

2- Li gorî pirsgirêkan hevokan binivîsin.

Mînak

Ez îsal diçim dibistaneke nû. Di fêrgehê de qet hevalên min tune ne. Ji ber ku ez hinekî şermok im, ez nikarim bi xwendekarên din re bipeyivim.

….Divê tu şerm nekî, bi xwendekarên din re bipeyivî û bi wan re bibî heval…

1- Ez ji waneya matematîkê qet fêhm nakim û ez ne serkeftî me.
Divê tu _____

2- Ez van rojan qelew dibim û nizanim çi bikim.
Divê tu _____

3- Hevala min bi min re napeyive û ez nizanim çima ew bi min re napeyive.
Divê tu _____

4- Diya min pir nexweş e û naçe nexweşxaneyê.
Divê tu _____

5- Bavê min qet naxwaze ez derkevim derve. Ji ber vê yekê ez nikarim hevalên xwe bibînim.
Divê tu _____

3- Hevokan biqedînin.

1- Ew westa ye. Divê ew _____

2- Ez birçî me. Divê ez _____

3- Tu nexweş î. Divê tu _____

4- Sibe rojbûna hevala min e. Divê ez _____

5- Mêvanên me hene. Divê em _____

6- Sibe ezmûna min heye. Divê ez _____

7- Tu pir lewaz î. Divê tu _____

8- Karê min pir e. Divê tu _____

Hin lêkerên hevedudanî

ji ber kirin, hîn bûn,
hîn kirin, qelew bûn,
paqij kirin, şerm kirin,
li xwe kirin, ji xwe kirin,
alîkarî kirin

4- Lêkeran li gorî forma rast bikişînin.

Sibe mevanên min tên. Divê ez serê sibehê zû _____ (rabûn) û malê paqij _____ (kirin) Piştre divê ez _____ (çûn) sûkê û hin pêdiviyan _____ (kirîn). Piştî sûkê divê ez xwarinê _____ (çêkirin).

A - Xebata li ser peyvan

1- Di bin wêneyan de navên cil û bergan binivîsin.

1_____



2_____

3_____

4_____

5_____

6_____

7_____

8_____

9_____

10_____

11_____

13_____

12_____

14_____



15_____

16_____

B- Bikaranîna zimên

1- Di hevokên li jêr de cihên vala bi payeya hevrûkirin û berztirînê dagirin.

1- Çiyayê Agirî ji Çiyayê Cûdî _____ e. (bilind)
2- Gola Wanê ji Gola Hezarê _____ e. (mezin)
3- Serjimara Suriyê ji ya Libnanê _____ e. (zêde)
4- Parzemîna Awistralyayê ji parzemîna Asyayê _____ e. (biçûk)
5- Kobanê ji Efrînê _____ e. (germ)
6- Li welatê me çiyayê _____ Agirî ye. (bilind)
7- Gerestêrka _____ Jupîter e. (mezin)
8- Li welatê me çemê _____ Çemê Feratê ye. (dirêj)
9- _____ sînemavanê kurd Yilmaz Guney e. (navdar)
10- Helbestvanê _____ ê kurmancî Elî Herîrî ye. (pêşîn)

2- Bi van peyvan li gorî forma karînê hevokan saz bikin.

Mînak

Ew / govend / girtin.
Ew dikare govendê bigire. (erênî)
Ew nikare govendê bigire. (neyînî)

1- Ez / avjenî / kirin (neyînî) _____
2- Tu / goga piyan / lîstin _____
3- Em / bi / îngilîzî / axivîn _____
4- Dîlan / wêne / çêkirin _____
5- Hûn / stran / gotin _____
6- Sîdar / tembûr / lêdan _____
7- Sînem / helbest / nivîsîn (neyînî) _____
8- Ez / xwarin / çêkirin _____

3- Lêkeran li gorî forma rast bikişînin.

1- Ji bo parastina xwezayê divê em av û hewayê qirêjî _____ (ne/ kirin). Divê em daran _____ (ne/birîn). Divê em ajalan _____ (ne/ kuştin).

